

Van rojên dawîn kêşeya kurd bi şeweyên cur bi cur tê platformên navneteweyî, gelek kes bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevdîtina çêdikin, pêwîstiya diyaloga bi PKK'ê re tînin zimên:

✓ **Micheal Gunter:**

Li Tirkiye siyasetmedarên xurt tune ne, ku hebûna dikaribûn kêşeya kurdî bi metodên siyasî çareser bikin.


✓ **Sheri Laizer:**

Dewletên Ewropayê divê rasterast bi Öcalan re bikevin têkiliyê, ji bo çareserîya kêşeya kurd rewş gunçaw e.

✓ **Aleksey Mitrofanov:**

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan federasyonê dixwaze, parlamenterên Rûsyayê vê daxwazê di cih de dibîne.

Rûpel-3



Di qada navneteweyî de dîtina serdest: Divê bi PKK'ê re hevdîtin çêbibin

Hevpeyvîn-Fener Rojbiyanî:

Panela kurteçîrokê
ya kurdî

R. 8-9

Lêkolîn-Gabar Çiyan:


Kirîna çekan û lêçûnên
leşkerî yên Tirkiyeyê

R. 4

Bîranîn:

Zanayek ket
ji refên şervanan

R. 6

Azadiya **WELAT**

SAMI TAN

Êdî meclîsa tirk dipejîne ku îşkence li ber destê hêzên dewletê ne karekî awarte ye. Li gorî nirxandina heyetên biyan, dewleta tirk piştî ku hewlên wê yên ji bo endamiya Yekîtiya Ewropayê di avê de çûn, hê zêdetir bêpaxav tevdigere.

Ji bo dagirkeran bêzagonî bûye zagon

Ji bo çavdêriya pîrozbahiyên Newrozê gelek heyetên biyanî hatin Kurdistan û Tirkiyeyê, bi ji hinek ji wan heyetan hatin serdana rojnameya me, di wan hevdiştinan de me li ser rewşa rojnameyê, arîşe û tengasiyên wê agahî dan wan. Piştî re me hinek pirs li ser çavdêriyên wan arasteyî wan kirin.

Di nav agahiyên ku me dan de helwesta dewleta tirk a li hemberî zimanê kurdî û rojnameya me bala wan kişand. Lewre ew tîngîhêjin ka çima dewlet hebûna zimanê kurdî napejirîne, piştî re jî dozê li nivîsên ku bi zimanê kurdî hatine nivîsîn vedike. Li aliyê din dema me got: "Ev demeke dirêj e, dewlet bi awayê legal di ser me de nayê, lê zêdetir bi awayekî bêqanûnî bi ser de tê.", zêde tiştêk ji wê yekê jî fêhm nekirin, dibe ku ji gotinên me jî ketibin şikê.

Lê pratîka hêzên dewletê ya hefteyekê wê dîtina me bi awayekî zelal

rave dike. Hêzên dewletê di pîrozbahiyên Newrozê tevî ku der barê rojnameyê tu biryara berhevkerinê tunebû jî dest danîn rojnameyên me. Dîsa nûçegihan û belavkarê me yê Îzmîrê Davut Özalp roja 1'ê avrêlê jî hêla hêzên dewletê ve hate girtin û ji polîsan lêdan xwar, ji bo ku rojnameyê belav neke, gef lê hatin xwarin. Ev tişt yek jî ne qanûnî ne, lê sedemêkê helwestê heye; êdî zagonên cuntayê yê faşîst jî li ber parastina berjewendiyên dagirkeran dibin asteng lewre ew metodên nehênî bi ser sazîyên demokratîk de diçe.

Dozên ku ji ber bûyerên bi vî rengî li dadgehên tirk tên yekirin, nagihêjin encamêkê û gelek mirov serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê didin, li wir dewleta tirk tê mehkûmkirin û şermezar dibe. Êdî meclîsa tirk dipejîne ku îşkence li ber destê hêzên dewletê ne karekî awarte ye, lê dîsa jî dev kirinên

bi vî rengî bernade.

Li gorî nirxandina heyetên biyan, dewleta tirk piştî ku hewlên wê yên ji bo endamiya Yekîtiya Ewropayê di avê de çûn, hê zêdetir bêpaxav tevdigere. Li ser rewşa kurdan jî ev nirxandin jî hêla endamên heyetan ve hate kirin: "Zilma û zordariya li ser gelê kurd zêdetir bûye, beramberî wê yekê, berxwedana gelê kurd jî zêdetir bûye." Dîsa me ji kesên ku beşdarî Newroza li Amedê bûne pirsî: "Hûn nûçeyên çapemeniya tirk ên li ser pîrozbahiyên çawa dibin?" Endamên heyetê dan zanîn ku nûçeyên çapemeniya tirk bêbinî ne, wan îdiayên der barê heyetên jî biyanî de red kirin.

Xuya ye ku piştî çûna wan heyetan wê rewşa dewleta tirk li Ewropa diwartir bibe, lewre heyetan daxuyandin ku ewê raporana amade bikin û pêşkêşî raya giştî û hikûmetên Ewropayê bikin.

Newroza 98'an bû hêviya Hakî û Kemal

Ferhengok

ajal: sewal, heywan	xizan
ajda: zildan, êz dan (filizlenme)	hincet: mazeret
aya: gelo, acaba	hîkarî: karîger, bandor
bermahî: jêmahî (artuk)	hûmêrîn: lêhûrbûn
berûl: xûgî, ruşwet	lêçûn: mesref
berxwedêr: direngen	ligel: digel, tevî
bişîrîn: besimîn	melîsîn: sinme, pusma
cangorî: qurban	nehênî: îlegal, veşarî
ciyawazî: cudahî, ferqiyet	nîgaş: xeyal
çavdêrî: raçavkirin (gözlem)	qesem: sond, yemîn
dahatî: gelir	payeberz: payebilind,
deq: teks, metin	radestkirin: teslimkirin
derbinîn: îfadekirin	ray: dîtîn, raman
derûnî: psikolojîk	reşbîn: bedbîn
dirûvandîn: şibandin	(karamsar)
destnîşankirin: tespîtkirin	sak: çelîka gamêş
diyafî: xelat (armağan)	serpereştî: rêberî, pêşengî
erk: rol, fonksiyon	serdêdan: serdan, ziyaret
gubezîn: neqîkirin	sinçîn: germkirina tendûr û hwd.
hawirde: ihracat	
hejar: reben, xizan	
hênbân: heban, keşkol	
hinarde: ithalat	
hejar: belengaz,	

ALAATTİN AKTAŞ

Newroza 98'an bi welatparêziyeke bilind û dilşewat li seranserê welêt û metropolan hate pîrozkirin. Pîrozbahiya îsal ji ya hemû salan hinekî cuda çêbû. Ev cudahî, pîrozbahiya îsal girîng dike.

Ji sala 1993'yan hetanî îsal dijminê mêtînger, li dijî gelê kurd şerê taybetî bi hovîti û qirêjiyêke pir mezin meşand. Bi sedhezaran mirovên kurd di îşkencexaneyan re derbas bûn, girtîgeh bi welatparêzên kurd hatin tijîkirin, çar hezar gund hatin valakirin û şewitandin, li dora deh hezar welatparêzên kurd hatin kuştin, bi milyonan mirovên kurd hatin koçberkirin. Li ser gelê me zad û xwarin hate birin. Kurdistan kirin zindan, kirin îşkencexane. Ev hemû ji bo ku gel û gerîla ji hev qut bibin, ji bo ku li ser gerîla behr were çikandin û gerîla bi rihetî were kuştin, hatin kirin. Her wiha, di van 5-6 salên dawî de li dijî gelê me wahşetêke pir mezin hate kirin. Armanç, pasîfikasyon, radestkirin û şikandina vîna gelê kurd bû. Dijmin dixwest ku gelê me li pêşberî şehîd û gerîla têkeve rewşa xiyaneî.

Bi vî awayî dijmin dixwest ku hem gelê me û hem jî gerîla marjînal bike, bîne niqteyêke bêzîrar. Ji bo bigihêje wê armançê, ji aliyekî ve ji li dijî gerîla bi domdarî şer û operasyonên herî mezin kirin û bi radyo, televizyon û rojnameyan bangeşiyêke (propaganda) mezin meşand û got: "Gerîla marjînal bûye, ew hew dikare livbaziyan pêk bîne û gelê kurd jî

hew alîkariya gerîla dike, dest û hêviyên xwe jê birîne, li nan û ava xwe, li aboriya xwe digere."

Di vî niqteyê de girîngiya pîrozbahiyê Newrozê derdikeve pêş. Gelê kurd careke din hêviyên dijmin û xiyaneî di qirika wan de hişt; Newroz, bi rengê serhildanê pîroz kir.

Di Newroza îsal de gelê me rasterast bi fermanên Serok derkete qadên pîrozbahî û serhildanê. Di bin berf û baranê de, bi sedhezaran mirovên kurd derketin

Di Newrozê de gelê kurd li metropolan, li qadên serhildanan, dest û mil û dil da gelê tirk, her du gelan bi hev re Newroz pîroz kir. Vê Newrozê yekîtiya têkoşîna gelan xurt kir. Bû hêvî û mirazê Hakî û Kemal.

qadan, di destê zarokan de kevirên ku tanqan qul dikin û li ser zimanê keç û xortan de tolhildan û dirûşmeyên îşyan û berxwedanê hebûn. Gel nehişt ku dijmin Newroza wî bike Nevruz û bidize. Gel nehişt ku, Newroz têkeve bin desthilatdariya dijmin û di salonan de were kedîkirin. Lewre Newroz berxwedan e, azadî ye, tu car nayê zincîrkirin, nayê zeptkirin û agirê wê nayê tefandin.

Vê Newrozê da xuyakirin ku, têkoşîna azadiyê rehên xwe berdane kûrahiya gelê kurd û doza azadiyê hatiye binaverokkirin. Her kesî dît ku, gelê kurd êdî keştî şe-

witandine û ketiye rîya bêveger. Ketiye rîya serkeftin û felatê. Bi vî awayî gelê me, daxwazî û biryara xwe ya rizgariyê nîşanî dijmin û hemû cîhane da. Newrozê nîşan da ku, êdî tu zilm û zor nikare giyanê gelê me yê serhildanê bikuje. Newroza îsal, bi pîrozbahiyê xwe bû destpêka serhildanê pêvajoya nû. Gel û gerîla, wê agirê Newrozê li sala 98'an belav bikin û wê bi berxwedan, ceng û serkeftinê mezin sala 98'an dagirin. Hetanî îsal di Newroz û hemû serhildanan de gerîla, coş û cesaret û moral dida gel. Lê di vî Newrozê de rewş cuda bû: Vê carê gel cesaret, coş û moral da gerîla; pê da fêrkirin ku ew tu carî gerîla bi tenê nahêle. Bi reh û can û mal xwe pê re ye. Da xuyakirin ku di rîya rizgariyê de ji tu bedel û fedakariyan xwe nade alî.

Dijmin bi vî Newrozê dît ku, kurd û Kurdistan di hiş û dilê gelê me de wînda kiriyê. Baş dît ku, karwanê rizgariyê jî niqteya bêveger jî bihuriye û di rîya felatê de pir bi pêş ketiye. Lewre dijmin di zilm û wahşetê de hatibû niqteya dawî. Ka ji vî niqteyê wê de wê çi bike?

Gelê kurd dest û dilê xwe dirêjî gelê tirk kir. Di Newrozê de gel jî li metropolan dest û mil û dil da gelê tirk. Vê Newrozê bingeha biratiya gelan, yekîtiya berxwedan û têkoşîna wan xurt kir. Ji gerîlayên Tirkiyeyê re bû giyanê navneteweyî, bû hêvî û mirazê Hakî û Kemal. Di sala 98'an de gelê me wê xwe bi vî giyanê bilind bi rê bixwe û bi gemaşî, bi gavên mezin bimeşe serkeftinan.

Di qada navneteweyî de dîtina serdest:

Divê bi PKK'ê re hevdîtin çêbibin

Her çiqas hêzên dagirker qala têkçûna tevgera azadîxwaz a gelê kurd bikin jî, gelê kurd hem li welêt, hem jî li derveyî welêt destkeftinên xwe zêdetir dike. Beramberî serkeftinên di warê leşkerî û siyasî de, giraniya tevgera kurd di qada navneteweyî de jî xurtir dibe. Li nik rojnameger û siyasîmedaran gelek rojnameger jî diçin bi Serokatiya Tevgera Azadîyê re hevdîtin û hevpeyvînan dikin û digel vê yekê kêşeya Kurdistanê tînin platformên navneteweyî. Bo nimûne berî niha bi du hefteyan akademîsyenê amerîkî Michael Gunter çû bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevpeyvînek pêk anî. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine, Gunter daye zanîn ku ew ê bîr û ramanên Öcalan ragihîne rayedarên Amerîkayê jî.

Li Princentonê Panela li ser kurdan

Gunter rojên 20-21'ê adarê beşdarî konferansêkê bû, li wir da zanîn ku li Tirkiyeyê siyasîmedarên xurt tune ne, heke hebûna wê karibûna kêşeya kurd bi metodên aştiyane çareser bikin. Gunter diyar kir ku, Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî di heman ramanê de ye. Di vê konferansa ku li Zanîngeha Princentonê, li New Jersey pêk hat de, gelek siyasîmedar û akademîsyen li ser kêşeya kurdî rawestiyân. Her çiqas konferans li ser rewşa kurdên Başûr be jî, şerê li Bakur jî hate rojevê. Bo nimûne, Burhan Elturânê di konferansê de axaftina duyemîn kir, got ku li Tirkiyeyê derfet nîn e ku hêzên dijber bi metodên demokratîk ramanên xwe bînin zimên, her cure dijberî bi tevkujîyan re rû bi rû maye. Elturân got: "Şerê ku bi pêşkeşîya PKK'ê ji bo mafê kurdan ên demokratîk tê kirin, bandoreke mezin li gelê kurd kiriye." Her wiha lêkolînerê kurd Amir Hasanpour jî da zanîn ku nasnameya kurd bi MED-TV bûye xwediyê çêkeke karîger, lewre jî di warê geşedana nasnameya kurdî de, di diwarojê de pêşketinên mezin dê pêk werin. Dîsa Muhammed Ahmed diyar kir ku, pêdiviya kurdan bi yekîtiyê heye, bi tenê bi vî awayî dikarin bikevin nava Neteweyên Yekbûyî. Ahmet piştê jî bal kişand ser xebatên Komîteyên Kurdistanê yên li Ewrûpayê û da zanîn ku ew komîte gelekî bi rêk û pêk karê xwe dimeşînin.

Laizer: Serokên wekî Öcalan kêm in

Li aliyê din Nivîskara îngilîz Sheri Laizer, piştî ku hevdîtinek bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re pêk anî, daxuyaniyek da Rojnameya Ûlkede Gündemê. Laizer da zanîn ku, divê dewletên ewrûpî derfetê bidin Öcalan ku ew dîtîna û ramanên xwe rasterast ragihîne wan. Nivîskara îngilîz Laizerê bal kişand ser xweseriya Öcalan, helwesta wî ya erênî ya di warê guftûgoyan de û diyar kir ku, ji bo çar-



Van rojên dawîn kêşeya kurd bi şeweyên cur bi cur tê platformên navneteweyî, gelek kes bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevdîtina çêdikin, pêwîstiya diyaloga bi PKK'ê re tînin zimên

reseriya kêşeya kurdî ji niha guncawtir dem tune ye. Sheri Laizer da xuya kir ku siyasîmedar û serokên wekî Öcalan li cîhanê kêm in.

Büyereke girîng jî roj 30'ê adarê li Parlementoya Rûsyayê qewimî. Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Kofi Annan li Parlementoya Rûsyayê hevdîtinek pêk anî. Di dema hevdîtinê de Serokê Komîsyona Jeopolîtîk a Parlementoya Rûsyayê Aleksî Mîtrofanov li ser navê komîsyona navborî nameyek arasteyî Kofi Annan kir.

Di vê nameyê de tê gotin ku pêwîst e, Neteweyên Yekbûyî trajediya gelê kurd bide rawestandî. Her wiha tê bibîrxistin ku gelê kurd li Neteweyên Yekbûyî nayê temsîlîkirin, ji ber vê yekê li qada navneteweyî nikare heta dawiyê mafên xwe biparêze. Dijminên kurdan jî vê yekê sûdê werdigirin û li dijî kurdan siyasîetê dikin.

Divê NY'ê trajediya li ser kurdan rawestîne

Dîsa di nameyê de tê destnîşankirin ku rewşa herî dijwar, rewşa kurdên li Tirkiyeyê ye, kurd li ser axa xwe ya dîrokî dijîn, hejmara wan digihêje 25 milyonî, lê belê dewleta tirk kurdan wekî gelekî napejirîne. Kurd nikarin bi kurdî bipeyvîn, dibistanên bi zimanê kurdî tune ne. Piştî van gotinan tê xwestin ku Neteweyên Yekbûyî destê alîkariyê dirêjî kurdan bike, wan ji bin jenosîda (qirkirin) artêşa tirk rizgar bike. Komîsyona Jeopolîtîk di nameya xwe de, balê dikişîne ser êrişên artêşa tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê jî, tê gotin ku li wir jî jenosîd li ser kurdan tê

meşandin. Bi taybetî kurdên penaber ên li Baregeha Etrûsê piştî ku NY'ê statûya penaberiyê ji ser rakir, bû hedefa êrişên hovane.

Di dîmahîka nameyê tê diyarkirin ku, ji ber vê siyaseta nemirovane ya dewleta tirk, kurdan bi pêşengîya PKK'ê ji bo parastina mafên xwe yên neteweyî dest avêtine çekan. Li ser vê yekê hikûmeta tirk navê "terorîstî û cûudaxwaziyê bi pey kurdan xistiye, lê di rastiyê de leşkerên tirk heta niha 4 hezar gundên kurdan vala kirine, 5 milyon kurd koçber kirine û Kurdistan kavi kirine. Lewre jî dewletê bi xwe terorîstî kiriye.

Her wiha di nameyê de li ser bangên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ên ji bo çareserîya siyasî jî tê rawestîna û ev nîrxandin tê kirin: "Bi dîtina me, heta Tirkiye mafên kurdan ên siyasî nas neke, şer dê her tim bidome. Ji ber ku Rûsya nêzî herême ye ewlehiya me jî dikeve talûkeyê. Her wiha li Dewletên Serbixwe milyonek kurd dijî, em divê daxwazên wan jî li ber çavan bigirin. Parlementoya Rûsyayê çar biryar li ser pîrsa kurd girtine, di nav wan biryaran de tê gotin ku, divê kêşeya kurdî bi metodên siyasî bê çareserîkirin. Di nav van biryaran de bang li NY'ê jî tê kirin. Birêz Kofi Annan divê hûn dest bavêjin vê kêşeyê kurdan û li dijî vê jenosîdê derkevin. Helwesta Serokê Kurdan A. Öcalan ne li dijî rêznameya NY'yê ye. Ew ji bo kurdan federasyonê dixwaze, parlementerên Rûsyayê jî vê daxwazê di cih de dibînin."

A.WELAT WASHINGTON/
MOSKOVA/STENBOL

Kurtenûçe

Mahir Çayan û 9 hevalên wî ku 30'yê adarê sala 1972'yan li gundê Kızıldere yê Nîksarê bi ser Tokatê ve jî hêla hêzên dewletê ve hatibûn kuştin, li Fakulteya Tîpê ya Zanîngeha Stenbolê bi forûmekê hatin bibîranîn. Merasîma bîranînê li kantîna fakulteyê bi beşdariya 200 endamên Ciwanên Şoresger (Devrimci Gençlik) pêk hat. Piştê herman tevkujî jî hêla endamên TÖDEF/IYÖDER, Platforma Maf û Azadîyê û DLMK'yê hate protestokirin.

Endamê Komîsyona Mafên Mîrovana Meclîsa Tirk û Parlementerê FP'ê Haşim Haşimi piştî gera xwe ya li ser girtîgehên li Kurdistanê daxuyand ku şertên girtîgehê zêde çepel û dijwar in û wezaretê dadê jî nikare ji bin van şertên giran rabe. Haşimi got ku pêwîst e meclîs li gorî rapora me ji bo çareseriyê hewl bide xwe. Haşim Haşimi wisa dom kir: "Ji leşkeran bigire heta rayedaran her kes dixwaze ku efûyê geştî derkeve, êdî nema mirov di girtîgehê de bi cih dibin."

Bavê Parlamenterê kurd Mehmet Sincar ku li Batmanê jî hêla Kontrayan ve hatibû şehîdkirin Tewfîq Sincar, şeva 30'ê adarê li Qoserê di 81 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Tewfîq Sincar bi beşdariya 15 hezar kesî li Goristana Qoserê hate definkirin. Di merasîma cenazeyê Sincar de, sloganên wekî "Apê Tewfîq Namir e" û "Şehîd Namirin" hatin avêtin. Li ser gora Sincar, Sekreterê HADEPa Mêrdînê Cemil Veske axaftinek kir û got: "Apê Tewfîq bavê kesên ku di têkoşîna demokrasî û azadîyê de jiyana xwe ji dest dane ye."

Komeleya Rojnamegerên Hemdem (ÇGD), bi mebesta 20'emîn salvegera dameziranîna ÇGD'yê bi navê "Şahiya 20 saliyê û Merasîma Xelatdayîna Rojnamegerên Salê" çalakîyek li dar xist. Nivîskarê Ûlkede Gündemê Varlık Özmenek "Xelata Rojnamegeriyê ya Mustafa Ekmekçi", "Xelata Piştgiriyê" li ser navê rojnameger û nivîskarên di girtîgehê de Doç. Haluk Gerger girt û di beşa hunerê de jî Nuçegîhanê Demokrasîyê Orhan Çabuk xelat wergerîtin.

Kirîna çekan û lêçûnên leşkerî yên Tirkîyeyê

Di serî de divê bê diyarkirin ku derxistina lêçûnên leşkerî yên Tirkîyeyê, lêkolînên pîralî û berfireh dixwaze. Li ser mesrefên leşkerî, zaniyariyên ji hemû kesan re vekirî hene û yên bi dizî hene. Yên vekirî, diyar in û peydekirina wan zêde ne diwar e. Lê yên bi dizî, bêhtir ji bazarên reş tîn peydekirin, kesên ku xerc dikin ne diyar in. Çiqas pere diçe? Kî li ser wan lêçûnan biryaran dide? Çi tîn kirin û buhayê wan çiqas e? Ne diyar in. Zanyarî, kêman in û wînda ne. Kes, reş in û reşahiya sistemê temsîl dikin. Di rewşeke wîsan de xebatên wîsan, tecrûbe, sebir û lêkolînên kolektîf û pîralî dixwazin. Di vê lokolînê de, em ê li ser lêçûnên leşkerî yên fermî rawestin. Armanca me ev e ku xwendevanên me, bi alîkariya lêçûnên vekirî, li ser lêçûnên bi dizî, bibin xwedî dîtinekê û hinekî ji senaryoyên reş ên Tirkîyeyê, bi alîkariya nimûneyên vekirî haydar bibin.

Înstîtuya Lêkolînan ji bo Aştiyê li Stockholmê-Sipri di rapora xwe ya sala 1988'an de dibêje ku; Tirkîye di kirîna çekên konvensiyonel de, li cihanê, di nav welatên pêşketî, welatê duwemîn e. Di salên 1983-1987'an de, li cihanê welatê 8'an e. Yanî Tirkîye, di 1983'yan de 470 milyon dolar, di 1984'an de 519 milyon dolar, di 1985'an de 498 milyon dolar, di 1986 de 789 milyon dolar, di 1987'an de 1 milyar 212 milyon dolar pere dane ji bo kirîna çekên konvensiyonel. Di rapora Stockholm International Peace Research Institute-Sipri ya 1990'î de, salên 1985-89'an hene. Li gorî raporê, Tirkîyeyê, di sala 1998'an de bi 1 milyar 238 milyon dolarî, di 1989'an de bi 1 milyar 134 milyon dolaran çekên konvensiyonel kirîne. Di rapora 1994'an de qala salên 1989-1993 tê kirin. Li gorî vê di sala 1990'î de bi 889 milyon dolaran, di 1991'ê de bi 887 milyon dolaran, di 1992'yan de bi 2 milyar 245 milyon dolaran, di 1993'yan de bi 2 milyar 525 milyon dolaran çek hatine kirin.

Şerê kevn yê "Daîreya Çavdêriya Çekan a Amerîkayê û Kêmkirina Çekan (ACDA)" Ruth Leger Sivard, di xebata xwe ya bi navê 1997-1998'an de li cihanê mesrefên leşkerî û civatî de li ser Tirkîyeyê zaniyariyê dide: "Tirkîye, di navbera 1981-1985'an de, bi 2 milyar 120 milyon dolaran çekên klasîk kirîne. Milyarek û bi 100 milyonê wê ji Amerîkayê, bi 800 milyon dolarê wê ji Almanyayê çek hatine kirin."

Deyndarî û rewşa Tirkîyeyê

Ji 1984'an û vir ve li Tirkîyeyê şer hene. Avakirina û perwerdekirina komên polisî, guhestina bi sedhezaran leşker bo navçeyên din, meaşên wan û lêçûna cerdevanan, ji bo nedîtina şer û kirîna li dijî mafên mirovan li Kurdistanê bertilên bo welatên ewrûpî, xwedîkirin, bicîhkirina bi milyonan leşker û polisyan û hwd. Tev sedemên buhabûn û bilindbûna enflasyonê li Tirkîyeyê ne. Şerê li Kurdistanê, kaniyên dewletê diçikîne, gepa devê xelkê li devê çekfiroşan diqelîbîne. Ji bîfî çikandin û ziwakirina kaniyan, şer dewletê dixê bin barê deynan û faîzên wan. Ji

ber deyn û faîzan, xizmetên civakî nayên kirin û li pey dimînin. Beşeke biçûk ji civatê dibe tacîrê şer, beşê mezin jî bi pîrsîrêkên pîralî re rû bi rû dimîne. Pîrsîrêk û tepînên politîk, aborî û civatî, didin dû hevûdin û civat nexweş dikeve. Dermanê nexweşiyê, parastina rastiye ye. Muxalefet e.

"TNI" ku navenda wê li Amsterdamê ye û lêkolînan li serciyawaziyên aborî û civakî di nav gel û welatan de dike, bi Înstîtuya Lêkolînên Politîk li Washingtonê-IFPS re projeyek bi navê "The Debt Boomerang (Boomerangê deynan)" de çêkiriye. Proje, bêhtir li ser sedemên deyndariya welatên ji cihana 3'yan disekine. Beşek jê qala Tirkîye dike: "Li Tirkîye şer heye. Ji ber şerê ku heye, her di sala 1998'an bi tenê, dewlet 37 milyar dolar deyndar bûye. Li wir şer ranewestiyaye. Di navbera salên 1990-1991'ê de ji bo dana deyn û faîzên wan, % 35 dahatûya xwe ya hawîrdeyê (ihracat) dide. Ji ber kirîna çekan, Tirkîye, di cihanê de di nav welatên herî deyndar de di rêza 9'an de ye.

Li welatên pêşketî, ji bo ku çekên xwe yên kevn bêyî ku xeterê bigihînin xwezayê, ji holê rakin, ji butçeyê, pereyên mezin vediqetînin. Ew li ser navê hevalbendiyê, riyên erzan û hêsantir dibînin ku xwe ji wan çekan rizgar bikin. An ku çekên xwe wekî diyarî û bêpere didin welatên xwedî problem.

Ev rastî ji aliyê dewletê bi xwe ve jî tê gotin. Ali Şevket Ereke ku di hikûmeta Çillerê de wezîrî dikir, di beyaneke xwe de wîsan gotibû: "Ji derveyî butçeyê, lêçûna me ya leşkerî 170 trilyon lîra ye. Dema deyn di hundirê butçe de bê hesabandin, lêçûn hildikişê 400 trilyon lîrayî. Ev jî tê wê wateyê ku, % 40 butçeyê, lêçûna me, ya leşkerî ye (10)."

Zibilxaneyayê çekên cihanê: Kurdistan

Dema projeyêke însidustriyê li welatên pêşketî têkeve jiyandê, yan jî pîrekê çêkirin, riyekê bê vekirin, avahiyên nû bînin avakirin, hikûmetên li wir her dem ditînin, xelkê ji awira "parastina xwezayê" ve digirin ber çavên xwe. Yan hikûmet bi serên xwe nikarin biryarê bidin. Dîtin û hesasiyeta xelkê zanin û heta ji wan tê, xwe ji xelkê dûr naxînin.

Mixabin li Tirkîyeyê, kesên ku sistemê îdare dikin, dema tîn ser kar, pêşî berikên xwe dadigrin. Çi kes ditînin xelkê nagire ber çavan. Jixwe li welêt, çar-pênc serî hene. Di nav seriyan de, beşek jê karê kirêt dikin, an ku diz in, mafya ne û hwd in.



Ev bêstîkrarî û hebûna şer, firsendeke mezin dide welatên pêşketî. Li welatên pêşketî, ji bo ku çekên xwe yên kevn bêyî ku xeterê bigihînin xwezayê, ji holê rakin, ji butçeyê, pereyên mezin vediqetînin. Ew li ser navê hevalbendiyê, riyên erzan û hêsantir dibînin ku xwe ji wan çekan rizgar bikin. An ku çekên xwe wekî diyarî û bêpere didin welatên xwedî problem.

Piştî yekbûna Almanyayê, bi tonan çer

kên rojhilatê Almanyayê li holê man. Danûstandina Almanyayê bi Tirkîyeyê re pir baş in. Ev her du welat, di çarçoweya NATO û Yekîtiya Ewropayê de ji xwedî eleqatên baş in. Pêwîstiya Tirkîyeyê bi çekên bêmesref heye ku li hemberî kurdan bi kar bîne, hêzên xwe biçek bike. Almanyayê jî dixwaze xwe ji çekên kevn, pê xercên giran rizgar bike. Belê, li ser van babetan li hevûdin dikin û çekên Tirkîyeyê. Tirkîye, heta ku jê tê van çekan nêzî, hêzên xwe, an ku li Kurdistanê depo dike.

Aliyekî din yê pîrsê heye. Ew jî qîrêjiya çek û santralên nuklerî ye. Pê ve girêdayî, jiholêrakirina çekên jehrî yên biyo-kîmyewî ye. Gelek welatên pêşketî peyman îmzekirine ku çekên xwe yên wîsan ji holê rakin. Lê mixabin jiholêrakirina çekên wîsan, ne hêsan e. Sebr û mesrefeke mezin dixwaze. Belê, li vir welatên mîna Tirkîyeyê dibin ambarên bermahiyan wan.

Ji sala 1990'î û vir ve gelek welatan ji bo kêmkirina çekan peyman mor-kirine û çekên li welatên xwe her roj kêmîtir dike. Di nav wan welatan de Tirkîye jî he-

ye. Wekî nimûne bi Peymana 1925'an a Cenevreyê û ya 1972'yan de ku Tirkîyeyê îmze kiriye, dewlet nikare çekên biyo-kîmyewî bi kar bîne û depo bike. Lê wekî ku Dr. İsmail Beşikçi dibêje: Kurdistan ne ji aliyê çend welatan ve hatiye dagirkirin. Ew bûye cihê qîrêjiyê tevayê welatên pêşketî. Bûye zibilxaneyayê wan, an ku zibilxane ya çekên wan yên kevn, depoya qîrêjiyê santralên wan yên nukleer û çekên kîmyewî. Ev dîtina me, ne îdia û bêbextî ye. Di pirtûka Jenonne Walker ku li ser pîrsa bêçekirina Ewropayê hatiye nivîsin û ji aliyê "Sipri" yê hatiye çapkirin de, xuyanî dibe ku çawa Kurdistanê dikin Zibilxane. Li Parisê 1990'î de peymanek ji bo kêmkirina çekên konvensiyonel hatiye îmzekirin. Tirkîyeyê jî îmze daniye ser vê peymanê. Lê Kurdistan an ku cihên ku kurd lê dijîn li derveyî vê peymanê hatiye girtin. Pîrs di benda "3'yemîn" şaxê 'B' de wîsan hatiye formûlekirin: "Mîntiqeyên Tirkîyeyê yên ji derveyî bakur û rovajayê wê pê ve nêzî paralela 39'an, piştî xeta li jêr, an ku ji Muradiye, Patnûs, Karayazî, Takman, Kemaliye, Fêke û Ceyhanê wir ve, li derveyî peymanê hatiye girtin." Ne ev tenê ye, belgeyên din jî hene. Wekî bi tonan çekên almanî û amûrekîyan ku bêpere tîn Kurdistanê (II). Li Siwerek, Mêrdîn û Mîdyatê avakirina depoyên nû di bin çavdêriya emerîkî û ewrûpiyan (n-13)

Belê, bi kinayî be jî li ser rewşa Tirkîyeyê, kirîna çekan, deynên wê û planên navneteweyî hinek zanyarî hate birêzkirin. Diyar e ku kirîna çekan û çêkirina çekan roj bi roj zêdetir dibe. Deynên Tirkîyeyê zêde dibin û gel ji awira aborî û politîk ve tê perçiqandin. Birêveberên Tirkîyeyê, ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî welatê kurdan kirine zibilxaneyayê piştîyên rojavayîyan. Ne tenê Kurdistan, Tirkîye jî para xwe ji van piştîyan distîne.

Dermankirina vê birînê, bi muxalefetê ve girêdayî ye. Îro, ji bo pêşeroja Tirkîyeyê jî, Kurdistanê jî kurd tîkoşînê didin. Piştîgiriya tîkoşîna gelê kurd dikare pîrsîrêkên welêt çareser bike.

Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

- Wane 5 -

Tîpên xweserî kurdî

Piştî ku em li ser hinek tîpên taybet rawestiyân, em dikarin hinekî jî qala dengên din bikin û derbasî mijarên din bibin.

Ji bilî çend tîpan, piraniya tîpên kurdî kurdî nêzî tîpên tirkî ne, lewre jî pêwîst nake ku mirov li ser wan bi berfirehî raweste. Mirov bi tenê dikare hinekî li ser tîpên "Q, Ê, W, X, Û" raweste. Tîpa /x/ ji qirikê derdikeve, mirov ji bo vê dengdarê, dikare mînakên wekî "xurt, axîm û tax" bide. Dîsa tîpa /q/ jî dengdareke qirikê ye, wekî "qaf" a erebî ye, peyvên "qenc, teqîn û req" dikarin ji bo nasandina vê tîpê re bibin mînak. Li ser tîpên "Ê, W, Û" berê hinekî hatibû rawestandî. Lê bi taybetî kesên ku hîni fonetîka tirkî bûne, di bilêvkirina wan de dikevin xeletiyên, lewre jî mirov dikare bi kurtasî li ser wan çend tîştan bibêje; her wekî berê jî hate gotin, tîpa /w/ nîvdengdêreke lêvan e, deng bi tevgera lêvan teşe digire, li cihekî naeliq. Ew wekî "Waw" a erebî ye. Cudatiya di nava wê û tîpa /v/ yê de gelekî berbiçav e. Dema mirov /v/ yê bi lêv dike, diranên pêşin digihêje lêva jêrîn û hinekî tê de tîpên guvaştin. Lê dema mirov /w/ yê bi lêv dike, diran bi tu awayî nagihêje lêvê. /V/ ya kurdî hinekî nêzî /f/ yê tê bilêv kirin. Peyvên "Wan, awa û ew" û dema digel peyvên "Van, ava û ev" bînan gotin, cudatiya her du tîpan bi awayekî berbiçav derdikeve holê.

Her wiha /Ê/ jî dengdêreke dirêj e, di navbera /e/ û /i/ de ye. Cudatiya di navbera wê û /e/ yê de gelekî diyar e. Ji bo jihevderxistina

her du tîpan xwendina mînakên wekî "êzing, têr (dijberê birçî), şêr" digel mînakên "ez, ter (şil), şer (ceng)" dikare bibe alîkar.

Her wekî berê jî hatibû gotin dengdara /û/ bi gelemperî wekî /u/ ya tirkî tê xwendin. Mirov dikare ji bo wê van mînanan bide: "Bûk, bûn, şûn, şûr, kûr". /U/ ya kurdî dengdêreke taybet e, her wekî berê jî hate gotin dengdêreke kurt e, ji tîpên /w/ û /i/ hevedudanî ye, ji bo wê jî peyvên "guh, gund, xurt, kul, du" dikarin bibin mînak. Kesên ku ji tirkî derbasî, kurdî dibin, /u/ ya kurdî wekî /u/ ya tirkî bi lêv dikin, ew jî dibe sedema hinek tevliheviyan. Lewre jî divê tu car neyê jibîrkirin ku /û/ ya kurdî cihê /u/ ya tirkî digire.

Li dîv ravekirina tîpan, pêkan e ku em derbasî, "kîte" yê bibin.

Kîte: Ew beşê peyvê ye ku bi yek carê re ji devê mirov derdikeve. Ji bo kîteyê pêdivî bi tîpeke dengdêr heye. Tîpeke dengdêr dikare bi serê xwe an jî digel çend tîpên dengdar, kîteyekê pêk bîne. Tîpeke dengdar bi serê xwe nikare kîteyekê pêk bîne.

Di kurdî de hejmara tîpên ku kîteyekê pêk tînin ji yekê heta pêncan e, bo nimûne; her tîpeke dengdêr dikare bibe kîteyek, wekî: ê, û, î...

Kîteyên bi du tîpan: Av, aş, ês, ar, ax, îm, jî, tî, pê, tê, çû, rû, ra, kî, sî

Kîteyên bi sê tîpan: Ast, tew, şev, kar, şer, têr, mêr, jêr, şîn, çûn, ran, xan

Kîteyên bi çar tîpan: tewr, şert, dewr, text, kevn, tevn, gewr, tirs, çewt, nerm, xîşm, rast, qenc

Kîteyên bi pênc tîpan: Stand, şkeft, stran...

Peyv ew tîst e ku ji kîteyekê yan çend kîteyan pêk tê û xwediyê wateyekê ye. Hest û ramanê mirov bi riya peyvên digihêjin mirovên din. Ew nimûnendeyê ramanekê ne. Çend peyv li gorî rêz û rêzîkên rêzimanî digihêjin hev û hevokêkê pêk tînin. Peyv li gorî hejmarê kîteyên ku wê pêk tînin, ji hev cuda dibin, peyvên yekîte û peyvên pîrkîte.

Peyvên yekîte: Av, tav, mar, ker, çak, yar, xewn, cêr, şik, tîr, bîn, şîn...

Peyvên pîrkîte: Baran, dewran, tevger, raxistin, çêkirin, şahî, şoreş, dewlemend...

Ji aliyê binesaziyê ve peyv dibin sê bir, hinek ji wan xwerû (sade) hinek ji wan jî pêkhatî û hinek jî hevedudanî ne. Peyvên xwerû mirov nikare ji hev bike, lê peyvên pêkhatî û hevedudanî, li gorî rêpîvanekê pêk hatine, mirov dikare bi hêsanî wan ji hev bike.

Peyvên xwerû: Azad, dest, hest, roj, şer, kan, jan, sar, ketin, jeng, ew, hiş

Peyvên pêkhatî: Azadî, destar, hestiyar, rojname, kanî, jana, sarinc, raketin, hişmendî...

Rêbazên darijtina peyvên

Di kurdî de peyv bi alîkariya hinek qertafan pêk tê, hinek ji wan qertefan bi dawiya peyvê ve dibin, ji ber vê yekê ji wan re paşgir an jî parkatê gotin. Hinek qertaf jî dikevin ber peyvên, ji wan re jî paşgir an jî pîrkatê gotin. Her wiha du peyv dikarin bînan ber hev, peyveke nû pêk bînin ji wan peyvên re, peyvên hevedudanî tê gotin. Ji ber ku ew mijareke berfireh e, emê paşê bi hûrbîni li serê

rawestin. Li vir bi tenê mirov dikare ji bo her yekê mînakêkê bide.

Peyvên bi alîkariya paşgirekê pêkhatî: Rabûn, hilanîn, vedan, daketin, çêkirin, raçavkirin...

Peyvên bi alîkariya paşgirekê pêkhatî: şadî, hişyar, destek, dizek, firandin, dayik, şînî, berçavk, tevger, şoreşger, karker, guhar...


Peyvên hevedudanî: desteng, çavreş, zikreş, germav, bêhteng, diltenik, çavbelek, piştrast, çavsor, heftreng, keskesor, payeberz...

Bîrên hevokê: Di hevokê de peyv li gorî barê ku digirin ser xwe, ji hev vediqetin, di kurmancî de bîrên hevokê deh in; navdêr, veqetandek, rengdêr, cînavk, lêker, jimarnav, hoker, daçek, gihanek û baneşan. Qismek ji wan di nava hevokê de ji aliyê form û teşeyê ve tîpên guhartin, qismek jî her tim wekî berê dimînin. Ji vê taybetiyê re guherbarî û neguherbarî tê gotin. Hêmanên guherbar ên hevokê, di nava hevokê de dirûvê xwe diguherînin, hinek tîp ji wan dikevin, hinek tîpên nû bi wan ve dibin, di nava wan de hinek tîp bi hinekên din tîpên guhartin, her wiha hinek qertafan digirin û li gorî rewşa ku tê de ne, dîtewin.

Di kurmancî de hêmanên wekî; navdêr, veqetandek, cînavk, jimarnav, lêker guherbar, li hemberî van, rengdêr, hoker, daçek, gihanek û baneşan neguherbar in û di nava hevokê de her tim wekî xwe dimînin. Ji ber ku dê yeko yeko li ser hemû hêmanên hevokê bê rawestandî û digel her bira hevokê emê dîsa vegehin ser mijara guherbarî û neguherbariyê, wê peyvê ji aliyê guherbariyê ve binirxînin, em li vir ser vê mijarê zêde ranawestin.

Bi hûrnêrînên dîrokî "Newroz"

CELALETTÎ YÖYLER



Di xwazim Newrozê bi hûrnêrînên civakî û dîrokî jî gelê xwe yê şoreşger re binirxînim. Ji demên beriya mîladê hetanî ve rojê Newroz li pey hev û bê navber di Kurdistanê de, têtê pîrozkirin. Lê ji demên kevn hetanî şoreşa Kawayê Hesinkar Newroz, cejna xwezayî û astronomî ye. Ango gelê kurd di demên kevn de hetanî îro, salnameya xwe, li gorî Newrozê saz kiriye. Bi awayekî din Newroz hetanî şoreşa Kawa cejna sersalê, biharê, astronomî û xwezayê ye. Dema ku 612 sal beriya mîladê, serhildana gelê kurd di bin ala serhildana Kawayê Hesinkar de pêk hat, cejna Newrozê bû cejnekê neteweyî û şoreşgerî û serhildanî. Yanî Newroz, di berê de cejnekê xwezayî û astronomî ye, wisa jî dibe cejnekê dîrokî ya şoreşgerî. Em dibêjin: "Ev cejn û şahiya hanê, çawa ya gelê kurd e, wisa jî ya gelên Rohhilata Navîn e. Yanî Newroz bi rewşa xwe ya xwezayî û astronomî, ji aliyê pîrên gelên Rohhilata Navîn ve, wekî farisan, aşûriyan, ermenî, bilûciyan, efganî, hindîyan û pakîstaniyan hatiye pîrozkirin. Lê bi rastî şoreşa Kawa rewş û rengekî din li vê cejnê bar dike û derfîne ser qada rojhilat. Ew jî serhildan û

şoreşgeriya Kawayê Hesinkar e. Ji ber ku wî pêşengiya serhildana çekdarî ya li dijî koledariya li ser gelên Rohhilata Navîn kiriye û ev koledarî jî holê rakiriye. Çi medî çi pîsmamên wan yên ku ji cur bi cur nijadê Arî ne.

Ji bona vê sedemê hemû gelên herêmê, bi gelê Med re ve cejna şoreşgerî ya Kawayî pîroz kiriye. Vê cejnê di warê şoreşgerî de xwe gihandiyê radeya herî bilind û bi rûmet. Rastiya cejna Newrozê bi zanîna min wiha ye. Em werin ser pîrozbahîya vê cejnê. Di demên beriya pêvajoya hişyariya gelê kurd ya di salên beriya destpêka tevgera rizgariya neteweyî de, gelê kurd di wan deman de agirê Newrozê bi navê 'Furik' dadida, di ser re qewaz dida û dilîst.

Lê nizanibûn ku ew cejna gelê kurd a şoreşgerî û dîrokî ye. Lê ji ber ku jî kûrahîya dîrokê pê de pê de, ji bav û kalikên wan hetanî wê rojê hatibû. Her çiqas ev nedizanî jî, dîsa pîroz dikirin. Lê gava ku pê hesiyana cejna wan a dîrokî û şoreşgerî ye, li serên çîyan dest bi agir dadanê kirin û bi zanebûn pîroz kirin. Pir mixabin her tim li ser hev, bûne hedefa êrîşên dagirkerên welatê xwe û hatine lêdan û zêrandin. Pir nînd tê bîra min, di salên beriya şoreşa çekdarî de, xortan di Newrozê de bi sedan û hezaran metro lastîk digihandin serê çîyan û agirê Newrozê hildikirin. Lê yek caran di heman şevê de, yek caran jî di heman rojê de hêzên dagirker diavêtin ser wî gundî û ji ber agir dadanê gel dizêrand.

Jixwe roja hişyariya gelê kurd û pîrozkirina Newrozê, bi rewşa wî ya şoreşgerî û dîrokî hetanî îro, dagirkerên welatê me bi hezaran kesên

me ji bona vê pîrozbahîyê kuştine û zêrandine. Her wisa xortên me yên wekî Mazlûm û qîzên me yên wekî Zekiya, Raşan, Bêrîvan û Ronahî canê xwe yê pîroz kirine agirê Newrozê. Ev tevgera van lehengên gelê kurd, di dîroka cihanê de nehatiye dîtin û hem jî ez bawer dikim nayê dîtin. Dema ku Newroz a Ergenekon be, van lehengan çima canê xwe yê pîroz kirine gorî? Hem jî dema ku Newroz a gelê tûranî bû, ev hezar sal e ku li wî welatî ne, çima pîroz nedikir? Em van mebestên xirab û nijadperestî baş dizanin. Hem jî ji bilî me raya giştî ya cihanê jî vê vir û derewan wan baş dizanin û bi wan dikenin. Hem jî pêkenîna herî mezin û derewa herî pintî, ev e ku vê cejnê bi "Hêkiça Hêkesor" ê pîroz dikin. Hêkiç ew e ku mirov serê du hêkan li hevde û bişkîne. Hêkesor jî ew e ku gelê ermen di cejnê xwe yê olî an jî neteweyî de pê dilîze. Yanî ev 'Hêkesor' ne ya me ye ne jî ya gelê tûranî ye. Çanda gelê ermen e. Kurdên me dibêjin: "Dema xuda şaş bike di erdê re kaş dike" ji ber ku cejn ne ya wan e, nizanin çawa jî pîroz bikin.

Hem jî tu giza "Hêkesorê" bi cejna Newroza gelê kurd jî tune ye û çanda gelê ermenî yê aryanî ye. Dîsa bila derewan nekin. Newroz a gelê kurd e. Lewre wan jî di vê pîrozbahîya ev baş dîtin. Ku digel zordarî, lêdan, kuştin û binçavkirina li ser gelê kurd dîsa jî bi hezaran derketin kolan û meydanan kirin qêrîn, gotin ev cejna gelê me ye. Destê xwe ji kuştin û girtinan bikiştin û werine ser riya biratiya gelan û wekheviya wan. Em jî mirov in û xwediyê hemû mafên mirovan in.

Ji bo bîranîna Dr. Memo (Mehmet Karademir) Zanayek ket ji refên şervanan

Li pey windakirina çavên te yên belek, dîsa bi vê sernivîsê min xwestibû tişteki binivîsim. Wê gavê jî wekî îro destê min li min nedigeriyan, zar û zimanê şêrîn û dewlemend têrê nedikir. Minê çî binivîsiya, bi çî awayî xem û kedera xwe derbibiriya.

Li Şateha şewitî te çavên xwe vekirin, li Mêrdîna wêranbûyî, li Ameda xopan, warê şêr û egîdah, paytexta Gulistanê mezin bûyî can. Zarokatiya te jî ne wekî ya her kesî bû. Dema te bîr birê, te çavên xwe vekir, te dost û dijmin yekser ji hev cuda kir.

Te digot: "Ev kesên ser bi tasîk(mifer) ên biyanî kî ne? Bila biqêştin ji welatê min." Tu bi biçûkanî bi lorikên kurdî mezin bûbûyî, ango te kurdayetî bi şîrê ter re xwaribû Memo can! Tu kurekî pir û pak, biaqil û bîrbir, zane û jîr bûyî. Tu bi stran û sirûdên niştîmanî û şoresgerî perwerde bûbûyî bira can. Hîn tu pênc salî bûyî; Şivan Perwer digot; "De lorî lorî kurê min lorî/Bavê te kuştin dayik bi gorî..." wekî her kurekî, lawekî kurd di-

lê te diêsiya, kela te tijî girî dibû. Lê ku dîsa digot: "Gernas û mêrxas bî/ Divê tu negrî..." Tore ye, mêr nabe bide girî û bike fixan, te hêsîrên xwîni bera nav û dilê xwe didan. Êşa dilê te ji ber wê bû qurban.

Tu di dibistanên dagirkeran de, di asîmîlasyonên zeman re derbas bûyî, lê tu ne kurê xwefiroşan, yê welatperweran bûyî. Tu berxwedana bêdeng ji destan, lawije û çîrokên kurdî, ji Xanî, ji Behrengî, ji Qizilcî fêr bûbûyî.

"Leylî Mecanî" nikaribû hez kirin û evîna welêt ji dilê te bibe, lê diviyabû ilm û zanist bi jîrî û zîrekî ji bo gelê xwe yê hejar fêr bibî û her fêr dibûyî bi ser fen û fûtên dijmin ve dibûyî.

Ji nav bi milyonan lawên gelê xwe yê hejar û bindest, tu yek ji sedî bûyî ku fersenda ilm û zanîstê bi dest xist û pê jî qebûl nedibûyî. Te digot: "Ez baz im, hêlîna min Cûdî ye, Girêşêra ye, warê pilingan e."


Te dizanibû temenê baz roj û danek e, lê te digot qeynak e, 'Bexê nêr ji bo kêr' e. Min digot, fersendê welê kêr dikevin

destê lawên gelê me, divê em baş bikar bînin, hêviyên xelkê xwe yê hejar li erdê nexin, nequrmiçînin, bi sebr û aram xwe bi armanca xwe bigihînin. Lê xwezî te bi ya xwe kiribûya, ew kul, hesret û keser di dilê te yê 'Têra her kesî dikir bes ya te nekir' de nemabûya heyran. Jiyana min bi xwendin û nivîsandinê derbas bûye, ji wê pê ve jî tu pişe, zanîn û karîna min tune ye. Lê piştî wê bûyera diltizên, ker û gêj bûme nizamim dê çî binivîsim. Dinya li ber çavên min mij û moran e, tişteki nabînim. Hişê min tarûmar, bela ye, nikarim du peyvan bi ser hev de bînim. Per û baskên min şikestin, dest û tilî pûç û hişk bûne, pênsûs pê ve nayê. Peyv têrê nake ku kela dilê xwe pê vereşînim...

Dibêjin "Mîrin hespê spî ye, li ber deriyê her kesî ye". Lê ketina nav axa sar a bedenên ciwan û tijî jî jîyan, ev bahoz, tofan û filîz qîran tenê li Kurdistanê, li welatê min ê bindestan e.

Mîrin tahl e, "Mîrin diya te bimire" mirin!...

YAKUP KARADEMİR



Dr. Memo (Mehmet Karademir)



ŞEHÎDÊ NEWROZA
1998'AN FIKRÎ BAYGELDÎ

*"Ji bo me nîrxên herî girîng şehîd in!
Guh bidin wî xortê Liceyî!" (Serokatî)*

*Ji mêj ve agir pîroz bû
Li ber dilê me kurdan
Lê bi şhadeta
Kawayê Hemdem
Mazlum Doğan
Bûka Amedê
Zekiye Alkan
Kulîlka metropolan
Raşan Demirel
Qîrîna li dijî împeryalîstan
Ronahî û Bêrîvan
û şhadeta te
Hevalê delal
Xortê Liceyî
Û helwesta
Heval Sema Yüce
Agir li ber dilê me
Pîroztir û delaltir bû.*

Şabaş ji we re!

**We agirê Newrozê gur kir
We têkoşîn li ser me ferztir kir.**

Xebatkarên Azadiya Welat

*"Serokê min, tu
nûnertiya
civakekê, çinekê,
dikî. Ji ber vê yekê
hemû dagirker,
împeryalîst û
noker êrişî te
dikin."
(Ji nameya Fikrî
Baygeldî)*



**FIKRÎ BAYGELDÎ
(1974-1998...)**

*Dibêjin:
Welatek hebûye, li nav kul û
birînan
Li ser singa wî kelehên zilmê
bilind bûne...
Dil bûne çar kerî
Jînek li nav qefesan
Jîyan li nav dojhê
Li ser navê jîne
Li tariyên zulûmat mirin hatiye
pêşkêşkirin...
Rojekê
Bi yek hevokê hatiye destpêkirin*

*Gav bi gav
Roj bi roj
Di deryaya êş û eleman de...
Zarokê ji giloka agir bûye ji
diya me re
Navê wî "SERHILDAN,
BERXWEDAN"
Navê wî "AGIR"
Roj bi roj
Gav bi gav
Di berxwedana
"SEROKATÎ"yê de
Geş dibe.*

**Xwarzê, te bi şewata agirê bedena xwe ya
pîroz tif kir rûyê îxanetê û te baweriya li
nav dilê me hîn zêdetir kir.**

ROŞAN LEZGÎN

□ 5 avrêl 1994:

Celal Barak (Zeynel) şehîd ket

Celal Barak, di sala 1980 'î de tevî xebatên PKK'ê dibe. Piştî darbeya 12'ê rezberê tê girtin û 5 salan li Girtîgeha Leşkerî ya Elezîzê radizê. Di dawiya sala 1986'an serbest tê berdan. Peyre diçe Akademiya Mahsun Korkmaz, ji wir jî diçe Eyaleta Amedê û di eniyê de cih digire. Piştî pêngava biharê ya sala 1994'an derbasî Dêrsimê dibe. Demekê koordinatoriya vî Eyelâtê dike, di 5'ê avrêla 1994'an de tevî 5 hevalên xwe şehîd dikeve.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 10 avrêl 1991:


Raperîna Başûr tîk çû

Li başûrê Kurdistanê, piştî tîkçûna 1995'an cara yekemîn piştî salên 1990'î careke din serhildan li dijî rejîma Baasîyan dest pê kir. Lê wekî serhildana 1975'an di avrêla 1991'ê de jî serhildana başûrê Kurdistanê ji hêla hêzên dewleta Iraqê ve bi êrîşên hovane hate perçiqandin, bi deh hezaran kurd koçberî Kurdistanê Bakur û Kurdistanê Rojhilat bûn.

Gelo kî ne rojnameger e?



Bulent Acar



Hasan Özgün

Li gorî Serokê Konseya Çapemeniyê Oktay Eksî, rojnamegerên girtî yê çapemeniya muxalîf, ne rojnameger in. Oktay Eksî roja 31'ê adarê li Hotel Intercontinental (Ceylan Palas) civîneke çapemeniyê li dar xist. Eksî di vî civînê de li ser rewşa rojnamegerên girtî, bîr û ramanên fermî anîn zimên. Li gorî wî, hin kesên ku di niha hin kesên ku wekî rojnameger tê xuyakirin, endamên rêxistinên nehênî ne. Lewre jî ew nikarin ji zagona lêborîne sîvîlê wergirin. Niha di girtîgehên Tirkiyeyê de 67 rojnameger girtî ne. Ew kes bi giştî an jî navendên rojnameyan hatine hilandin an jî li ser kar hatine binçavkirin. Tevî vî yekê jî, ew kes bi gelek tiştên nehênî hatine tawanbarkirin. Nivîskar û rojnameger Haluk Gerger, İsmail Beşikçi, Hasan Özgün û bûyera herî nêzik xebatkarê rojnameya Ûlkede Gündemê Bulent Acar li gorî Serokê Konseya Çapemeniyê Eksî, ne rojnameger in.

Li gorî Eksî jî 37 rojnamegeran ku di listeya wan rêxistinên navneteweyî ên rojnamegeran de cih digirin bi tenê 11 kes rojnameger in, 27 rojnamegerên din jî endam û alîkarê rêxistinên nehênî ne.

Konseya çapemeniyê gelek tiştan di ser guhê xwe re davêje. Bulent Acar roja 8'ê adarê li Qada Taksîmê jî aliyê polisên sîvîl ve bi awayekî hovane, li ber çavê hemû çapemeniya Tirkiyeyê û li ber girseya gel hate binçavkirin. Niha jî Acar bi endamtiya rêxistineke nehênî tê dari-zandin.

Oktay Eksîyê ku her roj qala mafên mirovan


û mafê derbirina ramanê dike û serokatiya konseya çapemeniyê dike, ku van rastîyan nebîne û xwe ji van rastîyan dûr bixe, divê ji gelek tiştên xwe bikeve şikê. Dîsa rojnameger Hasan Özgün li Amedê jî aliyê polisên ve ji bûroyê tê binçavkirin. Ew jî piştî binçavkirinê bi endamtiya rêxistineke nehênî tê sîcdarkirin û 12 sal û 6 meh ceza danê. Ji ber ku berî vîga jî wan kesên ku Eksî wan wekî endamên rêxistinên nehênî bi nav dike re, serokomar û serokwezîrê demekê "Rojnamegerên mîlîtan" gotibûn. Îro xuya ye ku Eksî ew kar girtiye ser xwe. Ji aliyekî ve gelek kesan jî bo ku ne xwediyê karta zer in, rojnameger nahesibînin, ji aliyê din ve jî destnîşan dike ku bo rojnamegeriyê karta zer ne pêwîst e.

Eksî di axaftina xwe de ya ku li ser navê Konseya Çapemeniyê kir, bela xwe di "CPJ (Komîteya Parastina Rojnamegeran)" jî da. Li gorî Eksî, CPJ'yê di rapora xwe de diyar kiriye ku Tirkiye di nav dewletên cihanê de welatê ku herî zaf rojnamevanan mahkûm dike ye. Eksî, dîsa siyaseta paşperdeyê domand û li gorî wî CPJ derewan dike. Li Tirkiyeyê bi tenê 11 rojnamegerên girtî hene. Eksî, di berdewama axaftina xwe de got ku, wê bi zagona nû ew kesên ku rojnameger in serbest bînin berdan. Piştî van gotinan ew dibêje ku Tirkiye di vî warê de welatekî bisabûqe ye. Ev nakokiyên li pey hev, siyaseta bi qirêj a ku li ser rojnamegerên muxalîf dide der. Gelo kesên ku di çapemeniya azad de dixebitin rojnamegerên rastîn in an kesên ku di çapemeniyê de dixebitin.

AZAD ALTUN

ÇAVDÊRÎ

Newroza kê pîroz nebe!



SERKAN BRÛSK

Di nav demsalan de, demsala herî xweş bihar e. Di nav hemû mehên demsalan de jî meha herî xweş adar e. Dîsa di nav hemû rojên adarê de, heta ne tenê di nav rojên meha adarê de, her wisa di nav hemû rojên salê de jî roja herî xweş giranbûha û manedar, roja bîst û yekê adarê ye, ku me û hemû gelên arî jê re gotiye roja nû ango Newroz. Yanî destpêka jiyaneke nû, ku ji jiyana berî xwe cudatir û pêşketitir e. Çima ji bo me kurdan ev roj ew qas manehilgir û manedartir e? Ev girîngiya vî rojê jî çi tê? Divê em çima vî rojê jî hemû rojên din veqetînin? Gelo ev xweserî û taybetmendiyê ku me li wateya vî rojê zêde kiriye çi ye?

Wekî tê zanîn Newroz li cem hemû gelên rojhilatî, wekî roja destpêka biharê tê pîrozkirin. Yanî li hemû deverên ku şopa Zêrdêstê Pêxember bi wan ketiye ango gelên ku di binyata xwe de arî ne, cejna Newrozê pîroz dikin. Îro jî li Îranê, Afganistanê û hetâ li hinek welatên Asyaya Navîn jî bi awayekî berdewam Newroz tê pîrozkirin.

Bi raya min, wateya ku vî rojê, bi berxwedana Kawayan hilgirtiye, wateyeke kurdî ye û mora kurdan lêketiye. Bi taybetî maneya ku "Kawayê Hemdem, Zekiye, Rehşan, Ronahî û Bêrivanê dane Newrozê pir girîng e. Newrozê li gel wateya xwe ya xweristî û surîştî maneyeke civakî jî hilgirtiye. Newroz, bi vî wateyê xwe nûjen û pêşverû dibe. Dibe hêviya roja nû ya bindestan. Ji bo rizgariya hemû çîn û beşên civakê, ku di bin zîlm û zora serdestan de dinalin, dibe hêvî. Heta ne tenê dibe hêvî. Her wisa jî bo meşa azadiyê, dibe kaniya îlhamê. Ji ber ku Kawa karê azadbûnê bi destê xwe pêkanibû. Çek bikaranîbû û gihabû armanca xwe. Ji ber ku çare nemabû. An wê zaroka wî ya dawî jî bihata cangorîkirin û bi vî awayî dê koka wî jî darê dinyayê bihata qelandin û an jî dê rahiştî çaçûk û li berxwe bida. Jiyane, ew bi van herdu hilbijartinan re anîbû hemberî hev. Edî kêr gihabû hestî. Yanî jiyana bûbû wekî îro. Kawa jî ya rast kiribû û karê azadkirina jiyane hildabû ser milên xwe û Dehaqê zalim jî navê rakiribû. Bi vî rakirinê re rîya jiyane li ber zarokên Medya vebûbû.

Nihîtê ku ketibû coka jiyane û nehiştibû ava wê biherike hatibû şikendandin û bi vî şikendandinê re ava cokê herikibû. Ava bi herk hemû gul û kulfîkên ku ji bêaviyê li ber hişkbûnê bûn, ter kiribû û vejandibû. Lê mixabin di vî demê de, ku ji sedsala bîstan re tenê du sal mane, dîsa jiyane em bi du hilbijartinan re anîne hemberî hev. Em piştî zêdeyî du hezar salan careke din pêrgî Dehaqên din tînin, ku dixwazin me ji bo tendirustî û xweşiya xwe bikin derman. Ji ber vî yekê xelkê me li seranserê cihanê, li Newroza xwe xwedî derket û ew bi çuşeke mezin û bi dilxweşî pîroz kir.

Ez dixwazim li ser bîngeha wateya ku pêşiyê me Kawa û Kawayê Hemdem dane Newrozê, cejna niştimana xwe bi derengî be jî pîroz bikim. Newroza şehîd, li şervan, zindanî, welatparêz, kedkar, zana û ronakbîrên te pîroz be. Em hevî dikin ku, ev pîrozbahîya me dê di rojên diyar de, di nav sar û seqemê de, di tengasiyên kemînan de, di pevçûnên diyar de û di êrîşên ser dijmin de, ji berxwedêrên te re bibe hêz û quwet. Dîsa silav li we û cejna Newrozê ya we pîroz be, hûn yê ku di rojên man û nemanê jiyana xwe dikin bês û davêjin dilê niştimana xwe û di nav çar dîwar de jî, ji ya xwe nayên xwarê.

Dil dixwest ku cejna Newrozê ya hemû law û keçên te bi dilxweşî û bi wijdaneke rehet pîroz kiribûya lê mixabin ku şîrheramî û îxaneta ku li dijî te tê kirin, nahêle ku ez pîrozkirina cejna newroz layikî hinek law û keçên te bibînin?

Li Başûrê Biçûk, Panela kurteçîrokê ya kurdî

FENER ROJBIYANÎ

Bi serpereştiya Koma Xanî ya Çand û Toreya Kurdî li Kurdistanê Sûriyeyê panelek di bin sernavê "Rewş û Cihê Kurteçîrokê di Toreya Kurdî de, Çawatiya Pêşketina Wê Wekî Curenivîseke Toreyî ya Nûjen" hat lidarxistin. Bi sedema rol û pêwîstiya kurteçîrokê, di pêşketina ziman û toreya kurdî de, min birêvebirina vê panela hanê hilgirt ser xwe û li gorî wê jî min gelek vexwendiname ji çîroknivîs û yên çîrokê dinivîsinin re bi rê kirin.

Pirs: Hûn rewşa çîroka kurdî ya hunerî li Kurdistanê û bi taybetî li beşa Suriyeyê çawa dinirxînin?

F.Çelebî: Bi nêrîna min, çîroka kurdî, cihê xwe xweşik negirtiye, ne ji ber ku çîroka kurdî qels e, lê belê ji ber nebûna xwendevanên weşanên kurdî ye. Xwendevanên kurd ne li Kurdistanê tenê, belkî li tevahiya Ewropayê, hê jî çênebûne. Xwendevanên îro, xwendevanên, helbesta klasîk in. Ji ber wilo çîroka kurdî cihê xweşik danegire lê belê hêvî hene. Ronak hene, çirîskan didin, wê pêşerojê geş ji çîroka kurdî re çêbikin.

Heybet: Rewşa çîroka kurdî girêdayî rewşa ramiyarî û aborî ye. Li gorî rewşa Kurdistanê, mixabin zimanê kurdî hê jî li paş e. Niha di herdu beşên başûrê welêt de, bingeha çîrokê tê avakirin, lê gelek bi zehmetî. Ji ber ku hê jî ew peyvên kevn di mêjiyê me de ne, di gel ku hevokên me li hevsiwarkirine, ew kesên ku dest bi nivîsandina çîrokan kirine, sê çar zehmetî dîtin. Çîroknivîs di warê çanda cihanî de ne têgihîştî bûn. Bi xebat û karekî wisa ranebûn ku peyv û hevokan bi pêşbixînin. Îro wekî kek Ferhad got, bingeha çîrokê taze ava dibe, nemaze li Kurdistanê Sûriyê. Ji ber ku wê yekê, di warê teknîk û derûnî de, xwe bi pêşxistina çîroknivîsan ne karekî hêsan e. Ku em nêrîneke giştî bidin çîrokên Ewropî hemû bi şeweyekî, mîna bûyerên rojane dihatin nivîsandin. Lê li cem me, îro çîroknivîsan ev qonaxa hane derbas kirine. Tiştên derûnî (psikolojîk) bi mebesta avakirina çîrokê tîn bikaranîn. Ev jî hêmaneke gelekî hêjayê ji bo kurteçîrokê.

A.Kovî: Divê em nêrînekê, li serdema berî peydabûna kurteçîrokê bidin û em bizanibin, ka çawa bû. Tiştê li pêşiya me hebû yan na? Îro helbesta kurdî li gorî kurteçîrokê gihaye asteke bilindtir. Çima? Ew helbestên kurdî yên ku bi navê stranên folklorî dihatin naskirin, roj bi roj gul vedan û bi pêş ketin. Ji hêla din ve ji ber tunebûna dem û dezgehên çandî, ji bo berdestkirina ziman, çand û toreya kurdî



Fener Rojbiyanî

derfet çênebûne. Lê berevajî wê yekê, di warê helbestê de, tiştê hebû, ku karîbû helbestê bipêşxîne; ew jî dibistanên feqîyan in. Van dibistanan rê li ber helbestê vekir, ta ku helbest bi rê ket. Lê kurteçîroka kurdî, ji wan çîrokên ku bi devkî di hat gotin û ji kurteçîrokên çend salên qedexkirî dûr ket. Pêşketina çîrokê ne bi rengekî siruştî bûye, wekî çîroka em dinivîsinin yan helbestan em dixwînin. Ji ber wilo, îro eger çîrok tîn nivîsandin, wê her bimîne. Îro çîroknivîs nizane cihê lingê xwe bigire û bi kîjan riyê de bimeşe. Tiştên îro tenê nivîsandin, wekî destpêk tîn jimartin.

Pîr Rustem: Tiştê li cem min heye. Ez nikarim bêjim ku rewşa kurteçîroka kurdî yan a erebî an jî ez kurteçîrokê bi miletekî ve girêbidim yan bi cografîya welatekî ve, lê çîrok dimîne. Çîrok divê di nav gel de cihê bilind bistîne. Lê hê jî ew gel li şûnde maye. Mebesta min bi kurteçîrokên kurdî, ew e ku, divê em çîrokên bilind bixwînin. Ez nikarim bêjim çîrok nîn e, lê çîrok wê tim hebe, lê dimîne ku em çîrokê girênedin, ku ev kurteçîroka vî miletî li paş e yan li pêş e.

Heybet: Çi civat be, di pêşveçûna xwe ya dirokî û civakî de dest bi nivîsandina helbestan dike. Helbest girêdayî rêjîma berî kapitalîzmê, di destpêka ketina mirovahiyê ango di kapitalîzma hovane de, rengên din cureyên din yê toreyî jî hebûn. Mîna çîrokên devkî, çîrokên li ser zimanê deweran, teyr û tewalan. Lê dema çîrok dikeve warê kapitalîzmê naveroka wê diguhere. Her kurteçîroknivîsek hestên xwe yên taybetî bi ser teşeya çîroka de radixîne. Di wê qonaxê de kurteçîrokê xwe ji nû ve ava kir. Kurteçîrok gava tê avakirin, wekî kek Pîr Rustem got, kurteçîrok girêdayî bi cografîyaya herêmekê ve nîn e ango kurteçîrok li ezman nîn e. Yek fransî

Zimanê kurdî, zimanê toreyê û ne zimanekî teng ango qels e. Ziman hino hino bi pêşdikeve û cihê xwe digire. Îro li beşê me, gelek nivîskarên mezin yên kurd, yên ku bi zimanê erebî dinivîsinin û gihane radeyêke bilind, pêwîstiya nivîsandina bi zimanê kurdî tînin zimên.

an îtalî be li ser Qamişlo binivîsîne, divê cografîyaya Qamişloyê baş nas bike û di çîrokên wî de diyar be.

Pirs: Nivîskarê fransî Roland Barthe dibêje: "Tu gel nîn e, ku bêkurteçîrok be, ne îro, ne berê, ne sibe." Pîrsa min, aya kurteçîrok wekî cureyekî toreyî li ser gelê kurd biyanî tê jimartin an jî bingeha wê di diroka toreya kurdî ya kevn de heye?

Ferhat: Bi rastî rehên kurteçîrokê di toreya kurdî de, kûr û kevn in. Lê aya çîrokên ku îro tîne nivîsandin, berdewama wan serpêhatiyên kurdî ne? Di vir de, ez nêrîna xwe wekî nêrîna Kovî dibînim. Ku rawestandinek çêbûya, di navbera çîroka kevn û nû de, ew rawestandina hanê, ku em ji nav dirokê de rahêjin, em ê bibînin, ku di wê demê de tu berhem çênebûne. Em xetekê di navbera herdu qonaxan de xêz bikin, li wir rawestîya, li wir dest pê kir. Em wê qonaxa vala rahêjin û herdu qonax bigihînin hevdu, em ê bibînin ku ne berdewama hev in. Tiştêkî windayî heye, ew serdema dirêj ya windayî. Îro ev çîroka tê nivîsandin, di bawerîya min de, ku eger ne ji bingehê toreyî be, ne bingehê pêmahîya kurdî be, lê gerek ji tiştêkî nû hatiye li vir pirseke xwe davêje pêş, eger kurteçîrokên îro ne berdewama serhatî û çîrokên gelêrî ne, gelo ev çîrokên hunerî ji ku hatine? Li vir xaleke vala û windayî heye ku, divê kesên ku çîrokên

nûjen dinivîsinin, li kelepura xwe vegehin û vekolinan çêbikin. Ji ber ku çîrok wê demê tunebûn. Dema ev karê han pêk be, wê demê, em dikarin bibêjin ku ev çîrokên îro berdewama pêmahîya kevn e. Lê îro ji ber tunebûna xwendevanan, ez bi tirs li wê meselê dinêrim. Ku ev çîrok ji ber akama (tesîr) romanêke wergerandî be yanî ez çîrokan bi erebî-îngîlîzî-fransî dixwînim û di hişê xwe de mîna çîrokekê dihonim.

Kovî: Li ser çîroka ku îro tê nivîsandin, eger em vegehin ew pêşketina çîroka folklorîk an jî geşbûna wê, ez dikarim bibim xwedî bawerîyê ku, ev çîroka îro, ne beşekî pêşketî ji çîrokê kevn e. Gava dibêjin xwendevanê çîrokê nîn e, tevgerê rexneyî li hemberî çîrokê nîn e. Di wê demê de ez dikarim bêjim, ev çîrokên nûjen ne bi pêşketineke xurt gihane me, ji ber ku çilo hatin wilo jî derbas bûn.

Heybet: Ez dixwazim li ser çîrok û serhatiyên kevn rawestim. Di bingeha wan de helbest tê jimartin. Çîroka nûjen berhema kapitalîzmê ye. Di vir de divê em tiştêkî ji bir nekin. Ev jî çanda cihanî ye. Îro çîrok li ser du stûnan ava dibe; yek çand û pêmahîya (kelepura) me ya kevn e ya din jî çanda cihanî ye. Divê em giş bizanibin ku mêjiya kurdan çawa dirûv girtiye. Di hemû destanên cihanî de, taybetê herêmî, cografîk heye. Di qonaxa kapitalîzmê de rawestîya cihanî û herêmî tîkel dibin. Çîroka îro ji herdu cokan tê avdan, divê em balê xwe bidin çanda cihanî û jê sîd wergerin. Ji ber ku ew gihaye asteke gelekî bilind.

Pîr Rustem: Ez dixwazim bersivê bi şeweyekî din bidim. Aya mêjiyê çîroknivîs berdewama mêjiya kurd yê kevn e an jî her çîroknivîsek xwedî mêjiyekî taybet



Pîr Rustem

KESÊN KU BERSIVÊ VÊ PANELA...

- 1-**Heybet Bawê Helebçe-Çîroknivîs:** Bi zimanê kurdî nivîsandin. Di kovarên mîna Stêr, Zanîn, Aso, Bawê Helebçe...
- 2-**Pîr Rustem-Çîroknivîs:** Bi sernavê "Rewş û Cihê Kurteçîrokê di Toreya Kurdî de, Çawatiya Pêşketina Wê Wekî Curenivîseke Toreyî ya Nûjen"...
- 3-**Ferhat Çelebî-Nivîskar:** Berpîrsiyarê "Koma Xanî" yemîn yê xelata Koma Xanî ye.
- 4-**Abdulhafîz Kovî-Nivîskar:** Berpîrsiyarê "Koma Xanî" Stêr, Zanîn de çîrokên wî hatine belavkirin. Herdu çîroknivîsên mayî, Helim Yusiv û M. rin.

qada ye? Ez dibînim, di mêjiyê her çiroknivîsekî/e de sê hoy hene, ku bi roleke mezîna radibin. Yek; biranîn û mîratxur, tiştên ku ji bav û kalan gihîştine me. Ya dîr xwendina min, ev gencîneya ez ji xwe re çêdikim, dihêle ku ez di warê çiroknivîsînê de bibim xwedî taybetiyekê. Ji çirok ta çirokekê din ez nebînim berdawemek ji hevdu re. Ji ber ku çiroknivîs digel çiroka xwe dimîne xwedî serboriyeye taybetî, lê pêmahîya kevn wê hîkariya xwe li ser çirokên îro bike.

Rexne û çirok yek in, ji hev cuda nabin, çiroknivîs rexnegir bi xwe ye. Çima? Ji ber ku teknîka wê fêm dîke, hêmanên sereke yên çirokê dizane. Lê gava em dibêjin hê çirok an çiroknivîs di gavên xwe yên pêşîn de ne, wilo jî rexne û rexnegir di gavên xwe yên pêşîn de ne.

Pirs: Em bîn ser çiroknivîsên Kurdistanê Iraqê. Di destpêkê de hewl dane xwe ku ji hêla 'teşe-şêwe- teknîk' ve çirokên biyanî kopî bikin, lê bi zimanekî kurdî. Bi vê ve girdayî em dikarin bêjin ku çirok nivîsandin cureyekî nû ye di toreyê kurdî de?

Pîr Rûstem: Çirok di nêrîna min de ne tenê li ser kurdan her wiha li ser gelên din jî mêvanekî nû ye. Ji bo çiroknivîsên Başûr, aya çirokên wan ji toreyê inglîzî hatina wergerandin yan taybetiyeye wan heye? Em bi bêjin nebêjin wê bandora toreyê inglîzî, fransîzî, rûsî, amerîka latînî, li ser ye kurdan hebe. Lê pîrsa min ev e ku, ev çiroka hanê çiroka kurdî ye an inglîzî, rûsî ye? Ez dikarim bêjin çirok dimîne çirokeke kurdî, xwedî taybetiyeye cihêreng, ji hêla ziman, şûnwar, cografîyaya Kurdistanê ve. Divê em ji bîr nekin, çiroknivîsên kurdan ji hêla derûnî ve, ne mîna yê biyanî ne. Dibe ku ez têkevim bin hîkariya çiroka kurdî ya derûnî, lê li hêla din jî divê ez pêwîstiya teknîka çiroka ewrûpî û bilindbûna wê ji bîr nekim.

Heybet: Ev babet gelekî diyar e. Yek ji wan çiroknivîsên Başûr, egêr realizma mîletê kurd ji çiroka xwe derxêne, em nikarin tu navî lê bikin. Ya din çiroka îro ya nûjen, ez ê navekî din lê bikim: Çiroka-navneteweyî. Teknîka wê ne herêmi ye lê belê navneteweyî ye wê ne ya fransî, inglîzî û rûsî ye.

Kovî: Ez nizanim nêrîna we li ser çiroknivîs çawa ye. Yek wekî pêxemberekî jîr lê dinêre, yê din mîna hunermendekî wênegir radihêje bûyerê û bûyerê wilo bi hêsanî û bêşîrove pêşkêşî xwendevanan dîke. Di bawerîya min de çiroka nû ne ev e. Ji ber ku çiroka îro hê jî di bin paçîk û hungulka hikayeyê de maye û di wê çar-

çoweyê de diji. Lê ji mercên wê, ji hêmanên çiroka nûjen, divê hem ji realizmê bistîne, hem jî rola nîgaşê (xeyal) jî di avakirina çirokê de hebe.

Heybet: Kek Kovî, nakokî li cem we heye. Nivîskarê Fransî Balzac bi mebesta erka çirokê dibêje: "Ez civata fransî di qula derzî yê re derbas dikim." Nîgaşa çiroknivîs tiştê gelekî pêwîst e, nîgaş nayê wê wateyê ku tu nîgaşekê ji xwe re ava bikî. Hunera civakê dibêje, ji te re vê dimenê han, ev realizma han, ta mêjiyê te

dikare ji xwe re nîgaşê bike.

Ferhad: Ez dibêjim hûn ji mijarê dûr derketin. Hûn behsa civaka nîgaşî (xeyalî) û çiroka rûdanî (realîst) dikin. Kek Heybet, çirokên rûdanî dinivîsîne lê nîgaşa wî, vê rûdana han gelekî pêş dixîne. Lê kek Pîr Rûstem li gorî şewenivîs Kafka diçe. Hûn bawer dikin ku însan bibe kêzik. Însan wilo nabe. Lê mebesta herdû ekolan jî pêşketina hebûna însanan e. Ez werim ser pîrsa wergerandina çirokên biyanî û li gorî wê ji çirok avakirîne. Bi nêrîna min, taybetiya zimanê kurdî heye, ev taybetiya han dihêle ku çirok jî bibe xwedî taybetiyekê cihêreng. Ev pîrsa han me dizivîrîne paş. Aya çiqas van çirokan sîd ji pêmahiyê û çanda kurdî girtiye? Ev jî li ser çiroknivîs dimîne, ka çiqas xwendiyê, agahiyên wî çî ne li ser toreyê xwe.

Em bîn ser xwendevanên çiroka kurdî, emê çawa bikaribin bingehekê ji xwendevanan re peyda bikin?

Pîr Rûstem: Eger em bizivîrin ser, ev astenga di navbera deq û xwendevan de, deqê kurdî, çî dibe bila bibe, helbest, çirok, raman, lêkolîneke rexneyî. Wekî berê min gotibû, du xwendevan hene. Yek xwendevanê ku hişê xwe, mêjiyê xwe digel deqê toreyî mijûl neke, serê xwe lê naxurîne, ev xwendevan bo min ne pêwîst e. Ez çiqas di ber nivîsandina çirokê de diwestim, ked û cefa dibînim, pêwîst e

xwendevan jî xwe biwestîne, ta ku karibe têbigihê, çî di navbera hevokan de heye. Berî her kesî ez xwendevanê xwe yê yekemîn im. Piştê ez hêdî hêdî xwendevanan diafirînim. Ji çiroknivîs nayê xwestin ku li ser vê babetê ango yekê din binivîsîne. Rojekê ji Resul Hemzatof pîrsîne: "Ka babetekê bejê ku ez li ser binivîsînim." Resul gotiye: "Ne babet, mêji, du çav û pênişêke xurt bo te pêwîst e." Bi nêrîna min, divê xwendevan hilkişe asta çiroknivîs, ne ku çiroknivîs dakeve asta xwendevan.

Heybet: Ev pîrsa han, pîrseke zimanê kurdî ye. Îro sê nêrîn li qada Kurdîstana Sûriyeyê hene. Hin dibêjin bila ziman, zimanekî hêsan be. Ne xem e, eger çend gotinên erebî, tirkî, farisî derbasî zimên bûne. Hinceta vê nêrîne zimanekî şahîk e. Hin dibêjin û ez jî yek ji wan im, bila ziman xwerû be. Hûn jî dibêjin bila zimanekî sormancî be. Ez vegerim ser axaftina kek Pîr Rûstem. Bi bawerîya min, mirov nabe xwendevanê xwe yê yekemîn. Çiroknivîs gava çirokê avadîke û dinivîsîne dibe xwendevan. Wilo jî mirov dibe xwendevan dema civak tê çirokê dixwîne, xwendevan ne yê min û yê te ye. Taybetiya kesayetiya xwendevan heye, divê em vê ji bîr nekin.

Kovî: Astenga xwendevan ne tenê ziman e. Em binêrin, li wan mîletên xwedî zimanê pêşketî, em ê heman gir û giriftên xwendevan bibînin û ku hê jî çareser nebûne. Xwendevan ne ew xwendevanê alfabe-yê, meramê me, ew xwendevan ku bê û berhemê bixwîne û tiştên veşarî li nav rîzan de, bi dahiyane têbigihê. Peydakirina xwendevanên bi vî rengî tozek zehmet e. Em nikarin karistana xwendevanan çêbikin. Lê emê tenê cureyekî xwendevanan biafirînin. Ev jî bi berdevambûne nivîsên xwedî radeya bilind gengaz e. Em çend kes li ser berhema Selîm Berekat "Feqeyên Tariyê" bicivin û ew kesê bi navê "Bêkes" yê ku di çend rûpelan ava dibe, dibe ku xwendevanekî nixandinekê bike, belkî derbirina nêrîneke ji hêla hunerî ve bilintir ji nêrîna Selîm Berekat. Ez li xwendevanên bi vî rengî digirim.

Ferhad: Emê çilo xwendevanan çêbikin? Wekî kek Fener got, erk û delemeta toreyê çî ye? Gava çirok pîrsgirêkên civatê çareser bike nemaze civateke hewcedarî çareseriyê, hewcedarê nas bike derdê wî çî ye? Ez dibêjim, xwendevan di vî halî de wê pirtir bin ji çiroka behsa derdekî dîrî mîlet dîke an jî wekî Kovî gotibû em çirokê wekî raporek siyasî binivîsin. Afirandina xwendevan girêdayî pêşketina ziman e. Bi nêrîna min wekî yê kek Pîr Rûstem e. Eger nivîskarêkî bixwaze pirtûkekê çap bike, divê tenê sed hejmaran çap bike û li ser wan kesên toredost û nivîskaran bêne belavkirin. Îro li Kurdistanê Suriyeyê ji ber rewşa em tê de ne nahêle ku xwendevan bi wê birçîbûnê here xwendîne, wê bi vê birçîbûnê here nanê xwe bîne.

Rexne, rexnegir, rola rexnegir di navbera xwendevan û çiroknivîs de çî ye?

Ferhad: Rexnegir bi wateya spî û reş, di nêrîna min de, ne rexnegir e. Filankes dostê min e, berhemên wî xweş in û yê din ne dostê min e berhemên wî xerab in. Ta niha, mixabin rexnegirên me bî vî ren-

gî ne û nimûneyên berbiçav di rojnamegeriya kurdî de tên dîtin. Di kovara Zanîn de, xortekî gotareke rexneyî li ser çirokên kek Heybet nivîsandibû. Me jî di quncîka "Darkê Hewdelê" lê vegeand. Eger yek ji çirokan fêma neke, bila nekeve warê rexneyan. Yekî din gotareke rexneyî nivîsand, bi nêrîna min, wî kesê han tiştên ne kifş ji me re ronî kirin û ramanên çirokan bi şeweyekî serketî, belkî ji Heybet serketîtir bû, behsa hin xalan di ramana Heybet kiribû belkî qet nedihata bîra wî. Rexnegir ew e ku bikaribe derbasî hundirê çirokê bibe. Ev çirok çî dixwaze? Mebesta çiroknivîs çî ye? Di wê demê de rexnegir dikare bibêje reş yan spî ye.

Heybet: Ta ku tevgereke rexneyî hebe, divê çirok jî hebe. Em nabêjin çirok nûn e, çirok, serhatî, destan, ji zû de hene. Rexne û çirok yek in, ji hev cuda nabin, yê çiroknivîs rexnegir bi xwe ye. Çima? Ji ber ku ji teknîka wê fêm dîke, hêmanên sereke yên çirokê dizane. Lê gava em dibêjin hê çirok an çiroknivîs di gavên xwe yên pêşîn de ne, wilo jî rexne û rexnegir di vî rewşê ne.

Pîr Rûstem: Ez dixwazim bi mîna-kekê beşdarî vê pîrsê bibim. Bi navê "Herî" çirokeke James Joyce heye. Rexnegirê fransî Robert Cholts li ser vê çirokê gotareke rexneyî dinivîsîne û dibêje: "Ev çirokeke wiha xerab û vala min di jiyana xwe de xwendiyê." Lê ev rexnegir, piştî diwanzdeh sal e, careke din li ser heman çirokê lêkolîneke rexneyî çêdike û digihêje encameke ku, ev çirok bilindtirîn çirok e, lê wî wê demê nikaribûye jê fêma bike. Ez dibînim rola rexnegir bêtirî ji rola çiroknivîs bi xwe ye. Rola rexnegir ne tenê şîrovekirina ramanan e. Her wiha ronî kirina mebesta çiroknivîs e. Rexnegir, bi mêjiyê xwe yê vekirî tê li ber xalên tarî radiweste û ronahî dîke û ji xwendevan re bibêje.

Em werin wan çirok nivîsên kurd yên ku bi kurdî dizanin, lê mixabin bi zimanên serdestan dinivîsin, pîrsa min gelo zimanê kurdî ji layê hunerî ve, ne gihaye wê qonaxê ku bikaribe dîmen û bûyerên hawidarê bi wêneyên hunerî, toreyî şayese bike û derbirîne?

Ferhad: Tiştê ku tu bixwazî bigihîni mîletên din, divê tu bi zimanê wan binivîsîni. Lê eger tu doza alîkariya ziman û pêşketina toreyê çî ye? Ez dibêjim, xwendevan di vî halî de wê pirtir bin ji çiroka behsa derdekî dîrî mîlet dîke an jî wekî Kovî gotibû em çirokê wekî raporek siyasî binivîsin. Afirandina xwendevan girêdayî pêşketina ziman e. Bi nêrîna min wekî yê kek Pîr Rûstem e. Eger nivîskarêkî bixwaze pirtûkekê çap bike, divê tenê sed hejmaran çap bike û li ser wan kesên toredost û nivîskaran bêne belavkirin. Îro li Kurdistanê Suriyeyê ji ber rewşa em tê de ne nahêle ku xwendevan bi wê birçîbûnê here xwendîne, wê bi vê birçîbûnê here nanê xwe bîne.

Kovî: Pîrs ziman e. Bêguman zimanê kurdî hinekî li paş maye li gor zimanên toreyî yên mîletên din. Lê em bibêjin, nivîskar pê mebest û hestên xwe bîne zimên û pê berhemên xwe ava bike. Ev gotin, tam ne di cih de ye. Lê eger nivîskar bixwaze tozekî xwe biwestîne wê bikaribe bi serbikeve.



Ferhad Çelebî

... "Mada û Zerdest" pirtûkeke wî hate we-
Rohilat de çirokên wî belav bûn.
Beravetî û Pilindir" du berhemên wî der-
de çirokên wî derketin.
kurdî Zanîn û Gulistan e. Xelatgirê du-
kovara Aso ye. Di kovarên mîna Aso,
M. daxwaziya lêborînê pêşkêşî me ki-


Hunera me, ji hunera jiyanê re xizmet dike

Brecht, bi şanoya epîk a ku wî afirand, berê guftûgo û berberiyên şanogerî yên şanoya sed sala dawîn, bi awayekî berbiçav destnîşan kir. Destnîşankirinên teorîk, ên ku di dîrokê de yekemîn car ji hêla Aristoteles ve di sed sala 5. B.Z (Berî Zayinê) de, di pirtûka bi navê Poetîka de hatin berhev kirin, heya sed sala dawîn ji şanoyê re bûn bingeh. Şoreşa sosyalîst a ku şêl û dirûv digirt, qanûnên diyalektîk ên ku ji aliyê Marks ve hatin afirandin, pêwîstiya şanoyê ku derdixist pêş. Di heman demê de vê yekê dijberiya şanoya Aristotelesî dikir. Lewre şanoya Aristoteles, li ser hîmên felsefeya îdealîst hatibû avakirin.

Armanca şanoyê: "Di derûniya kesa de afirandina hestên tirs û liberetîne û bi vî awayî şuştina derûniya kesa ji tirsan (katharsîs) e." Vê têgihiştina felsefîk, bi felsefeya ku armanca wê "naskirina cihanê" ye re li hev dikir. Lê belê têgihiştina felsefîk ya ku Marks danî holê, dida xuyakirin ku naskirina cihanê qîm nake, divê di heman katê de pêwîstiya guherîna wê ji bê zanîn. Bi gotineke bêhtir zelal, şanoya nû ya ku wê bê avakirin, pêwîst e li ser qanûnên guherîna bê avakirin.

Di vê pêvajoya ku em tê de ne de, şa-

ji layê Pîscator bingeha wê hat avêtin û ku Brecht bi xwe jî dûvajoyê wê bû, berxwedaneke watedar û girîng dimeşand. Şanoya siyasî, şanoya ku nakokiyên "kêd û mêtîngeriye" bi hev û din re li ber çavan radixe ye. Bi raxistina van nakokiyên, alîgiriya îdeolojiya çînekê dike û girseyan ji bo "ji nû ve avakirina cihanê" perwerde dike. Şanoya siyasî, di riya bidestxistina naverokeke fêrker û didaktîk de gaveke girîng avêtiye. Bi baweriya Pîscator, şano parlamento ye, temaşevan endamên parlamentoyê yên qanûnçêker in. Vê rewşê, kêmasiyeke ku mirov dikare bibêje: pir berbiçav e, di nav xwe de diheband. Ew jî, nebûna rola kêfxweşkirinê ya ku rola herî girîng a listikê ye, bû. Her çiqas metoda fêrkirinê ya Pîscator, teknîkên pîralî yên şanoyê pêşkêş dikirin jî, ji bo ku aliyên wê yên kêfxweşkirinê tunebûn, şanoyê naverok jar derdiket holê. Brecht, li ser vê yekê dijberiya xwe da xuya kirin. "Divê şanoger wekî ku diçin semînerê neçin şanoyê, divê ew ji bo pêşkêşkirina şanoyê derkevin ser sehneyê." Ew, vê dijberiya xwe, bi zelalkirina helwesta siyasî û rola şanoyê ji xurt dike û digihêje encameke wiha: "Polîtîka tê jiyîn, şano tê listin... Şanoya ku, bi kêfxweşkirina miro-



Bertolt Brecht

Helwesta Brecht, şanoyê dike navgîneke şer û têkoşîna ji bo jiyanê spehîr. Wî dida zanîn ku, hewlên ji bo nûjenkirina şewazên birjuwazî bêkêr in û bes şewazên nûjen dikarin teşeyên nû biafirînin. Wî digot: "Polîtîka tê jiyîn, şano tê listin... Şanoya ku, bi kêfxweşkirina mirovan, wan fêrî rastiyê nake, di jiyana me de cihê wê tune ye."

no hêdî hêdî erk û rola xwe ya civakî ji dest dide. Şano, li dijî sînemayê ya, ku berhemeke teknolojiya heyamê ye, têk diçe. Şanoya heyî, tîkiliya xwe ya bi temaşevanan re ji dest dide. Şano, ji jiyana mirovan bi dûr dikeve û di warê şarezabûnê de têk diçe. Bi vê rewşa xwe şano, nakokî û çalakiya civakê di ser guhê xwe re diavêje û dike ku mirov qîma xwe bi sîstema kapitalîst û cîhana derewîn bîne û bi vî awayî di nav bextewariyeke qaşo de bijî.

Vê rewşê rê li ber geşbûn û zêdebûna lêgerîna rêbazên nû vedikir. Heya sed sala 21. her çiqas tevgerên şanoyê yên cur bi cur derketibin jî, wan nekarîna xwe ji pîvanên ku Aristoteles danîbûn, rizgar bikin. Li ser vê, Brecht wiha digot: "Şewazên şanoyê yên ku bêwestan û rawestan û bi awayekî bedbin tînan ceribandî, nagihêjin serî û dixitimîn." Wî dida zanîn ku, hewlên bo nûjenkirina şewazên birjuwazî bêkêr in û bes şewazên nûjen dikarin teşeyên nû biafirînin. Di vî warî de ekola "Şanoya proleter" an jî "Şanoya siyasî" ya ku

van, wan fêrî rastiyê nake, di jiyana me cihê wê tune ye."

Brecht pê dizane ku şanoyê nû, bes bi rexnekirina şanoya raborî dikare bê avakirin. Ew li ser şanoya Yewnanîstana kevnare heya şanoyên gelêrî yên kevnepî, dest bi lêkolîneke hûrbînî dike. Di şanoya çînî ya gelêrî de ji xwe re serîsteyên (nîşane) girîng dibîne. 'Efkta biyanîkirinê' ya ku wî li hemberî katharsîsa Aristoteles dirûvandibû û bi pêş ve biribû, ji şanoya çînî ya gelêrî digire û ji şanoya hemdem a îroyîn re dike çêkeke girîng. Bingeha Şanoya Epîk jî ji efkta biyanîkirinê pêk tê. Brecht prensîpên hunerê yên şanoya nû destnîşan dike, di heman demê de ku teşeyên nû yên listinê bibîne. Peywîrên bingehîn ên ku ji hêla guherîna heyamê ve li şanogaran tînan barkirin, fêm dike û ji ber pêkanî û divêtiya dirûvandîna civakeke nû, "pêwîstiya bipêşvebirina efkta biyanîkirinê" dibîne. Brecht derbarê şanogaran çîni de dibêje "Berî her tiştî wekî ku ji bilî sê dîwarên ku wî radîpêçînin, dîwarekî çaremîn heye, tevnage-

re; pê bizane ku ew li hemberî komek temaşevanan e û vê jî dide der." Ev dîtin, dîwarê çaremîn ê ku yek ji pîvanên herî sereke ên şanoya kevnepî ye, ji holê radîke, temaşevanê neçalak (pasîf) red dike û têkoşîna afirandina temaşevanekî/e hîn çalaktir dide destpêkirin. Pêwîst e ku, temaşevan li fen û fîta birjuwa, wekî ku ji dûr ve bi dizî lê temaşe dike, neqelibe. Divê şano, nebe efsûneke tevlihev. Divê şanoya nû bişibe qada sîrkê ya ku rituelên heyamên lipaşmayî tîne bîra mirov. Lehengên vê şanoyê, perçeyek ji jiyana rojane ne, şano zelal û şayîk e; tîp û bûyerên wê asayî ne û ji jiyana me ya rojane hatine wergirtin. Her wiha temaşevan, di şanoya bi vî rengî de pêwîst e ku bûyeran ji nêz ve bişopîne, car caran beşdarî listikê bibe, destkariyê tê de bike, hêrsa xwe bîne, li dijî tîştina derkeve.

Dîsa divê temaşevan, bikaribe li ser sedemên bûyerê bifikire û ji bûyeran encaman wergirîne. Temaşevan divê, wekî qebîleyeke ku bi riya rituelên paşverû, li çareserîya problemên xwe digere û gava dibîne, ew dikare cihanê biguherîne, kêfxweş û bi hêz dibê, bibe. Brecht bi vê dîtina xwe, da xuyakirin ku, pêwîst e şano li çavkaniyên xwe yên resen vege-re. Wî jî vê dest pê kir û tragediyayên Yewnanîstana kevnare, Shakespeare, Moliere, Stanislavsky û êkolên şanoyê yên sed sala 20. da ber lêkolîneke hûrbînî. Piştî vê yekê di warê şanoyê de esansên materyalîzma diyalektîk cihê xwe girtin.

Brecht diramatûrgiya şanoya kevnepî nepejirand, diramatûrgiya xwe ya şanoyê afirand. Di vê teknîka diramatûrgiyê de, ya ku wî wekî Xebata Meselan bi nav kiriye, pêvajoya qedandina listikê di pêvajoya berî ku listik li ser sehneyê bê pêşkêşkirin de, ji aliyê hemû komê ve tê domandin. Xebata Meselan rê li ber bi hevkarî afirandina listikê vedike. Bi vî awayî, huner ji hestên kesa ên taybet û fantastîk tê rizgarkirin. Rê li ber lînerîna diyalektîk a derbarê berhemên hunerî de ku beşek ji afirandin civakî ye, vedibe.

Di vê xebatê de, hemû detayên listikê tînan lêkolandin. Şanoger dikare berî ku listikê bilîze biguherîne, bi pêş ve bibe û dirûvekî nû bidê. Ev helwest, şanoyê dike navgîneke şer û têkoşîna bo jiyanê spehîr. Hunera me, ji hunera jiyanê, ya ku hunera herî hêja û dijwar e re xizmet dike.

Derhêner, listikvan, teknîkerên ronahiya, mûzîkjen, dekorator... Her kes di karê xwe de bûye pispor, ên ku bi awayekî ji hevdu cuda pêdiviyên karûbarê xwe bi cih tînin. Şewaza xebata çerxa kapitalîst a ku hunermend dadixê radeya pişekaran an jî memûran, ji holê tê rakirin. Hunermendên ku di nav Xebata Meselê de cih digirin dê di nav laboratiwarekê de, di riya têgihiştin û guherandina cihanê de bibin xwediyên erka zanyarên ku li riya çareseriyê digerin û wê bi vê erkê biafirînin.

ERDAL CEVİZ
Ji tirkî werger: Kawa Nemir

NÇM-Stenbol

- 4 avrêl 1998 Şemf: Pêşandana Dîayê "Çiyayê Munzur"
Amadekar: Ismail Batî saet: 14:30
"Lîrîna Aso" Şanoya Hêvî, saet: 17:30
- 5 avrêl 1998 Yekşem: Konsera "Domanê Dêrsim", saet: 14:00
"Lîrîna Aso" Şanoya Hêvî, saet: 17:30
- 7 avrêl 1998 Sêşem: Konsera "Koma Rojhilat", saet: 14:00
- 8 avrêl 1998 Çarşem: Konsera "Koma Gulên Xerzan", saet: 14:00
- 9 avrêl 1998 Pêncşem: Konsera "Koma Vengê Sodir", saet: 14:00




NÇM-İzmir

- 5 avrêl 1998 Yekşem: Konsera bi navê "Ez gul bûm" ji aliyê Koma Şengal ve li saet 18:00 an tê pêşkêşkirin.
- 7 avrêl 1998 Sêşem: Pîrozbahîya Cejna Qurbanê
- 8 avrêl 1998 Pêncşem: Ji NÇM'ya Edeneyê Teatra Yekbûn bi navê "Agirê Gel" şanoyekê saet di 15:00'an pêşkêş dike.
- 10 avrêl 1998 În: Teatra Yekbûn "Agirê Gel", saet: 16:00

Wîna du kesan ji goristana 1494 kesî girîngtir e!

Tîtanîk



Di sala 1912'an de keştiyeke zor mezin ji Brîtanyayê bi 2200 rêwiyî berê xwe dide Okyanûsa Atlantîkê. Ji ber ku keştî pir lûks û bi ewlebûye, gelek dewlemend û navdarên Brîtanî di wê rêwîtiyê de, di Tîtanîkê de cihê xwe digirin. Di katê rajorîn de kesên ji çîna serdestan, di katê navîn de kesên ji çîna navîncî(orta) û di kata xwarîn de ji kesên ji çîna bindestan rêwîtiyê dikin. Herçiqas ew keştî bi lêçûmên (mesref) gelekî mezin hatibe çekirin (1.5 milyar kron, 1 dolar bi 8 kroniyê) û ji her aliyê ve bi teknolojiyê pêşkêşî hatibe saz kirin jî, di şevê ta- nî de li aysberkî(gireqêşa) diqelibe û tevî rêwiyên xwe, ev keştiya mucîzeyî noqav dibe. 1494 rêwî jiya- na xwe ji dest didin û 706 kes jî ji mirinê difilitin. Sazkarên keştiyê gotibûn ku, xwedê jî nikare vê keş- tiyê tîk bibe. Wê demê, armanceke xwediyê keştiyê hebûye, xwestiye ku dema ew gihîştin rawestgeha dawîn, di hemû rojnameyan de qala keştiyê bê kirin û di cihanê de bibe navdartirîn keştî. Li ser "Tîtanîk" gelek çîrok hatin nivîsandin û film hatin kişandin. Ji van filman ê dawî "Tîtanîk" ku derhêneriya wî ji ali- yê James Cameron ve hatiye kirin, dimenên binavê

hatine girtin, ji bo ku nêzî rastiye be. Cameron hîna di sala 1985'an de dest amadehiya kişandina filmê karesata Tîtanîk kirine.

Di filmê "Tîtanîk" de lêgerînerên tiştên giranbiha, di keştiyê de li elmasan digerin. Ev lêgerîner ji Rose- yê, ku ji keştiyê sax filitiye, li çîroka Tîtanîkê gihda- ri dikin. Di keştiya Tîtanîk de, Jack Dawson û Rose Dewitt Butcater hevûdu nasdikin û ji hev hez dikin. Wisa ji hev hezdikin ku hetanî mirinê destê wan jî hev nabe. Jack, di kata xwarîn ya çîna sêyem de rê- wîtiya xwe dike, Rose jî li kata rajorîn di nav çîna ye- kem de. Rose, bi dergistî ye. Dergistiyê Rose jî miro- vekî dewlemend û navdar e. Ew naxwaze ku Rose bi Jack re tîkiliyêke evîndarî deyne. Lê bayê evîna di navbera Rose û Jack de, hemû hewlên dergistiyê Ro- seyê, tîkdibe. Bi kurtasî naveroka film li ser vê evîndariyê hatiye honandin.


Di film de derhêner gelek tişt di ser guhê xwe re avêtine. Bêhtirîn evîna du kesan derketiye pêş. Dema keştî tîk diçe, ev du kes jî 1494 kesî bi qedirtir xuya dikin. Ji her kesî re deriyê dinyayê din vedibe, lê ji bo wan rîya evîne di nav wê kambaxiyê de vedibe. Ji gel pêştir şexsiyet derketine pêş.

Filmê Tîtanîk, ku di sala 1998'an de hatibû çekirin, li gel derfetên wê demê, ji vî filmê dawîn tîrnavoktir û nêzî rastiye ye. Di wî filmê de, rûmet dabûn miro- van, qala goristana rastîn a Tîtanîkê hatibû kirin. Lê îro li ser goristan mirovan bi rîya vî filmî qumar ha- tiye listin. Armanç(\$) bi dest xistina Oskaran e. Be- lê bi ser ketin, gelek xelatên Oskarê jî girtin, lewre li film gelek pere hatibûn xerckirin. Ev kevneşopiyêke sînemaya împeryalist e. Ew ji nav goristanan mijarên durî rastiya jiyane hildibijêre. Li gel van yekan, car caran evîni û xemgîniyê gelekî zîz li filmên xwe bar dikin. Lê ew hest jî hestên derewîn in. Ji bo ku xwe bi temaşekaran şêrîn bikin, çî ji destê wan tê dikin.

SERWÎSA ÇANDÊ

TÎŞK

Newroz bimbarek bo



KAZIM TEMÜRLÛK

Newroz belka ra heştê kuno nûştîşê hergu hevalî, çî ke raştiya xo na wa. Newroz emser ze şîma serî taye fikirî çel kerdî, badros kerdî. Hena wertê qomê ma de bîle tayinê qeweta şarê ma ra şîfekerdene. Çîqas ke tesîrê propogandeya dewleta tirkî naye de bibo jî, şarê ma de taye ca tîvar be qome xo nêkerd.

Serê mîletê ma de hona tersê dewlete rind nêrijiyo. Cokra wa ke xeylê sere ebe şîfeniyadane, zaf bawer nêkenê. Înan gore dewlet qewetîna a, kes nêşikîno verva dewlete pêro dero. Mane xo jî rew ra nat vajîna. E dewlete tanqî, topî, tayerey estê. Ma ê ma, çikê ma esta? Aye jî vane caver de kirmancî hata nika niyanem te kaleke ke, naye ra dima berê te lewe. Îştê serê mîletê ma de zafêrên na perse esta. Mîlet ke jû nêbi, mîlet ke qesa xo jê nêkerdê, çîtur verva dûgele vejîno. Ma heştay ra raver jî eke şiyene werte mîletî, şarê ma niya vatenê, nika jî hona na qesa xo dekernene. Hama na seronê peyinan de her ke dewlete va ke ma qedenay, mîletî tenena, raştiye diye. Niyada ke boyna vane qediyay, hama onca dane pêro, onca erzene xo ver. Mîlet tiya de vînenê ke her ke şî dewlete pey gaman erzene.

Ewro meste vana heştî aşmî, serî verene ra. Enflasyon na sere an wan nêbeno, serna an war nebena, hikûmetî yenê, şonê. Nê faktorî pêro, serê mordemî de persan kene ya. No senî ceng o ke dewlete niya honde qewetîna hama onca jî verva gerîla boyna wertê çetiniye ra nêvejîna. Newroz qedexe wo, va ke dewlete nika vana roşenê ma wo. Süleyman Demirel hors gureto, dano aşin ro. Yanê henî kenê ke Asinkar Kawa rê jî wayir bivejiye.

Na Newroz de qomê ma mûskna ke îndî ke nişikîno, şarê me bitersno. Ters û xoftî hurînda xo çustiyê re caverdo. Amed de ze laşerî mîletê ma Newroz bimbarek kerd. Domananê filîstîni ebe kemeran şî tanqan se. Ebe girmike şî tanqan ser. Domanê Amedî dayina zêde cesaret dabe qomê ma.

Newrozê 98'î mîletê ma dayina zêde jûbîn rê kerd nêjdî. Newroz mîletê mawo ke jûbîn ra dûrî yo ard te lewe. Kurdistanîjo welat ra dûr jî, rozgenê xo bimbarek kerd. Newroz nika îndî dina de nas beno.

Hendî bawer kon ke sere qomê şîfe rind bî kemî. Şîfe çîqas ke serê şarê ma de bî kemî, hondê zaf mesela xo rê wayir vejîno. Çîqas ke wayirê mesela xo bi, zêde, honde rew resene emelê xo.

PERWERDEHIYA ZIMANÊ KURDÎ DEST PÊ DIKE

Ji bo hînkirina xwendin û nivîsandinê di bin banê Înstîtuya Kurdî de, roja 11'ê avrêlê kuma zimanê kurdî dest pê dike. Kesên ku di wazîn beşdar bibin divê serî li Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê bidin.

Înstîtuya Kurdî
Navnîşan: Atatürk Bulvarı, Ceylan Palas
Apt. No: 154/12 Aksaray-İstanbul
Tel: 527 19 11

Gurê gîzme sor

Demsala zivistanê
Sewalên daristanê
Hemû li hev civiyan
Hinek ji wan giriyan
Bi hawar û bangkirin
Ax bi ser xwe dakirin
Gotin: We hay jê nîn e?
Îro ji bo me şîn e
Tiştê hatî serê me
Pir nexweş e mîrê me
Yê ku bihîst ew xeber
Bê rawestin diçûn ser
Biçûk-mezin, hûr û gir
Teyr û tulûr, hirç û gur
Ger çi hebûn ew ajal
Hemû rabûn çûn ji mal
Yek yek çûn ber serê şêr
Mal tijî bû jor û jêr
Hin rûniştin li eywanê
Yên hatin sertêdanê
Halê mîrê xwe pirsîn
Li ber çong dan melisîn
Hin rûniştin hin rabûn
Tev ji ser hev belav bûn
Gotin: Wilo çênabe
Tu êş bêderman nabe
Divê em rabin herin
Derman bînin vegezin
Gava derketin ji mal
Naliya şêrê bêhal
Ku dengê şêr hate gur
Neçû xwe ragirt li wir
Li ber serê şêr rûnişt
Jê re gotin gelek tişt
Got: Ev bû çend rojên min
Xew neketî çavê min
Ne ez tenê pir heval
Hemû hatin neçûn mal
Ne xwarin, ne vexwarin
Tev ji bo te li kar in
Çi sewalên ku hene
Li ber fermana tene
Çi kesê daristanê
Tev hatin sertêdanê
Lê ewê ziman zêde
Tu carî nehat vê de
Tu dizanî ew kî ye?
Yê dibêjim, rovî ye
Ew ê xayîn û fenek
Ketiye kêfa belek
Gava êşa te bihîst
Wî ji kêfan re dilîst
Ku me li wir da girî
Bi ken li me zivirî
Xwe li dijî me qure kir
Qeşmeriya xwe bi me kir
Çi dibêji mîrê min?
Dest û ling û serê min
Şêr bersiva gur dide
Got: Ku ew nebe winda
Dizanim ez ê çî bikim jê
De ka ew roja ku bê
Ku te got hat bîra min
Mêrik nehat dora min
Sewal hatin ji her der
Belê nehat ew qeşmer
Bi rastî ka li ku ye?

Dêmek ne xema wî ye
Serê min ket ji alî
Ez ketime vî halî
Îro maye bi serê xwe
Qet nade vir berê xwe
Ku şêr wilo qehirî
Gur rabû çû ber serî
Got: Qet xwe aciz neke
Em pir in rovî yek e
Balîf da ber pala şêr
Gelek hurmet kire jêr
Rûniştibûn pir sewal
Ku bû êvar çûne mal
Rovî hate dora wan
Halê şêr pirsî ji wan
Got çi heye çi tune?
Ev çend roj in, hûn li ku ne?
Pêşî bêhna xwe vedan
Dû re rabûn bersiv dan
Ger çi hebû li wê de
Me bi xwe re anî vê de
Wekî ku tu dizanî
Şêr nexweş e bi giranî
Kesek nema ku nehat
Tenê, deng ji te nehat
Ji roja ku em çûne wir
Li ber serê şêr e gur
Ew tim ji te bi rik e
Ba şêr xeyba te dike
Digot: "Rovî bêxêr e"
Îro zikê wî têr e
Tu carî te nas nake
Ji bo te xwe tal nake
Gur gelek tişt li ser kir
Bi rastî şêr bawer kir
Ku vê carê rabe şêr
Ew ji bo te nabe xêr
Rovî xatir ji wan xwest
Kaxiz-pênûs xiste dest
Guh di serî de dilive
Deşt û çiyayî dipîve
Riya rovî pir dûr e
Ax û kevir dihûre
Riya rovî dirêj e
Di ber xwe de dibêje
Divê tiştêkî bikim
Bo ku şêr razî bikim
Li mal rûnişt ponijî
Planek xiste mêjî
Û qet bi ser şêr neket
Bêdeng li malê raket
Çi li mala şêr heye
Hayê rovî jê heye
Êdî borîn roj û meh
Rovî pir tişt kirin seh
Gur ji cem şêr ranabe
Gote şêr: "Wiha nabe
Dîsa nehat ew zilam
Çi dibêji ez xulam?
Weleh ne hawê wî ye
De ka bavo li ku ye?
Rovî li mal digere
Ferman bide bila were
şêr gotina gur birî
Rabû ser xwe sincirî
Got: Vê yekê ji bîr nakim
Ger fermana wî rakim

Hînê ew tişt nebû bîst
Rovî li malê bihîst
Rabû got: Ger ez herim
Wir sax bikim vegezin
Kaxizek kir sê çar par
Lê nivîsî bi hejmar
Pêça, xist, bêrika xwe
Veşart kîn û rika xwe
Hêdî hêdî meşiya
Wargeha şêr bû xuya
Ku gihîst devê derî
Pêşî gur dît li serî
Gur li wir pal vedaye
Her du ling jî radaye
Ku rovî derî vekir
Tu kesî guh lê nekir
Rû nedanê sewalan
Xwe avêt nav şekalan
Ku derî ma vekirî
Gur gelekî qehirî
Got: Zû derî bigirin
Kesên bêxêr li vir in
Gava dengê gur çû şêr
Hişyar bû nêri li jêr
Rabû çavê xwe gerand
Serê xwe li rovî hejand
Got: Eferim ji te re!
Tu bûy zilam ji xwe re
Vaye ev bû meha min
Lingê te nehat ba min
Tu li ku bûy vê mehê?
Qey tu çû bûy dojhê?
Êdî Xwedê mezin e
Sonda qesem li min e
Ez ê te darizînim
Hesab bi te re bibînim
Ku şêr dike qisên gir
Nayê ser hev devê gur
Kêfa gur pir li cî ye
Bo ku li dijî rovî ye
Gur got: Kêf kêfa min e
Temenê rovî kin e
Hay tune jî felekê
Ku rovî bike dekê
Şêr awirek da rovî
Temenê wî bir nêvî
Rovî stuwê xwe xwar kir
Bêdeng li şêr guhdar kir
Paşê axivî ji dil
Got: Tim ez im yê bi kul
Ma pey hişê te nîn e?
Yê li cem te ew kî ne?
Çi fêda wan li te bû?
Zimanê wan zêde bû
Ji min çêtir dizanî
Kê ji wan derman anî?
Ev serê meha min e
Ne xew e ne xwarin e
Ku tu ketî nav cihan
Min daye serê riyay
Bo êşa te ya dijwar
Derman geryam bêhejmar
Hekîm hekîm geryam
Ku min dît vegeziyam
Tev de bijîşk û zana
Gotin navê dermanan
Ger min ji kê dipirsî
Wan yek derman nivîsî
Gotin: Êdî negere
Derman ev e vegere
Şêr pir şa bû bişirî
Gotina rovî birî
Got: Dermanê min çi ye?
Ka zû bêje li ku ye?
Meha min bû bêhal im
Raketî me li mal im
Ger te anibe derman
Bo te nîn e tu ferman
Meclîsê bigerînim

Li wir efa te bînim
Rovî hate nêzikê
Dest avête bêrikê
Kaxiza derman derxist
Agir bi mala gur xist
Got: Xwendina min nîn e
Mîrê min tu bixwîne
Ez nizanim bê çî ye
Li wir nivîsandiye
Kaxizek din kire der
Wî derman kiribû ji ber
Li derman nepirsîbû
Wî bi xwe nivîsîbû
Haya kesî jê nebû
Fena rovî bi xwe bû
Belê şêr guman nekir
Wê kaxiza din vekir
Şêr kaxizê dixwîne
Navê derman dibîne
"Ew dermanê êşa şêr
Me danî ye wa li jêr
Gava ku hûn bixwînin
Ger hûn zû derman bînin
Em bijîşk, bi ilmê zanî
Navê derman me danî
Navê derman li jêr
Bê wê her tişt bêxêr e
Navê derman li wir e
Ew goştê saqa gur e
Ku şêr wî goştî bixwe
Û avê bi ser de vexwe
Dê bibe wekî pola
Derkeve serê çola
Tiştêkî wî namîne
Ev ji bo we mîzgîn e
Gava nivîs qediya
Ziravê gur qetiya
Dest piyê wî lerizî
Ji xwe re got bi dizî:
"Ev çi bû hat serê min?
Ket mirinê berê min"
Şêr got: Rabin bi rê din
Dest piyê gur girêdin
Wî derxin devê derî
Bigirin wan çavên serî
Bivirekî tûj bînin
Hêta gur bifirînin
Hinek goştê sor jêkin
Li agir kin zû çêkin
Daxwaza şêr anîn cî
Baş girêdan dest û pî
Çêbû wekî dilê rovî
Hêta gur birin nêvî
Goştê saqê jê kirin
Xwê bi ser de werkirin
Bi cih anîn ew ferman
Şêrê nexweş xwar derman
Şêr hate sêra berê
Kesek nema li wê derê
Seqet ma gurê fesad
Rovî li wir bû azad
Her du ajal ketin rê
Rovî li pêş gur li pê
Her du ji hev qetiyan
Bi hev re nemeşiyay
Yek bi jor de çû yek bi jêr
Rovî da riya nezêr
Gur ma li ser sê piya
Xwîn ji saqê rijiya
Rovî ban gur kir li jor
Got: Lo xwediyê gizma sor!
Te duh fikir xeyba min
Va tu ketî tirba min.
Fesadî ne tiştêk e
Ev ji bo te hindik e
Çîrok dide me wane
Hinek mirov wiha ne

Koma Rewşen: Dûvajoya Prometheus

Qêrîna 'Çiyayê Bêzar'



"Şopandina hunera Prometheusê mûjenê ku ji Zeus agir diziye û famkirina evîna şerên giran çiqas dijwar be, şopandina hunera wan ji ew qas dijwar e û pê mijûlbûn dîvêt." (Ji berga Çiyayê Bêzar)

Huner û mûzîka kurdan ji wekî wêjeya kurdan li derveyî Kurdistanê dipişkive û dikemile. Her çiqas dijwar be ji kurd li dûrî çavkaniyên hunera xwe jî, di warê çand û hunerî de bi pêş dikevin. Îro li Kurdistanê, kurd nikarin li ser çand û hunera bixebi-

tin. Li aliyê din li Stenbol, Edene, İzmir û Mêrsînê li wêlâtê xerîbiyê hunera kurdan aj da.

Koma Rewşen yek ji berhemên van xebatan e. Kom, ji sala 1995'an ve li NÇM'la Edeneyê xebatên xwe didomîne û bi navê 'Çiyayê Bêzar' kaseta xwe ya yekemîn derxist.

Di kasetê de motîfên kurdewarî ne berbiçav in. Digel vê di stranên gelêrî de jî motîfên mûzîka rojavayî hatine bikaranîn. Wekî mînak di strana "Leyla" de motîfên şewaza Country xwe didin der. Dîsa di strana "Hosî" de, ku dimilkî ye, ne berbiçav be jî

motîfên rockê û cazwarî hene. Stranên kasetê yên gelêrî bi awaz û şewaza xwe serkeftî ne. Bi taybetî strana bi navê 'Hosî' ku ji herêma Paloyê hatiye berhevkerin, balkêş e. Ji vê stranê pê ve stranên bi navê "Şiblano, Heyran, Leylan" stranên gelêrî ne.

Strana 'Çiyayê Bêzar' ku navê wê li kasetê hatiye kirin, bi awaza xwe ya zîz balê dikişîne. Helbesta vê stranê ji aliyê Serokê Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê Hasan Kaya ve hatine ristîn. Dîsa wekî xaleke bal-

kêş, gotinên stranên bi navê "Şeva çaran û Zekiya" ji helbestên girtiyar hatine wergirtin.

Li aliyê din di warê têgînên muzîkê de tesîra fikirîna tirkî xwe dide xuyakirin. Wekî mînak ji bo kesê/a ku distrê peyva 'şîrove' hatiye xebitandin. Ev peyv rasterast ji 'yorum'a tirkî hatiye wergirtin. Mîrov dikare li şûna peyva şîrove strîner ango strînkâr bi kar bîne. Dîsa li şûna awaz, mûzîk hatiye bikaranîn, ev jî ne cihê xwe de ye. Lewre naveroka peyva mûzîkê berfirehtir e.

Wekî her car di vê kasetê de jî gotinên stranên ji aliyê wêjeyî ve ne serkeftî ne. Gava mirov bala xwe dide gotinên stranên komên kurdî di tevan de peyvên wekî; stêrk, kulîlk, zozan, çiya, serkeftin, ronahiya çavan, tol, hêlin, bihar, gul, erd û ezman, hawar, qêrîn, welat, gul, evîn, dijmin, serhildan' bi heman şeweyî tîrî bikaranîn. Bêguman divê mirov behsa têkoşîn, welêt û şehîdan bike lê divê bi şewazeke cihêreng û xweser ev yek bê kirin. Her çiqas kêr be jî, helbestên kurdî yên têrtîjî yên hêjayî bestekirinê, hene. Ev jî bo pêşketina mûzîka kurdî jî pêwîst û bikêrhatî ye.

MAZLUM DOĞAN

Ji stranbêj Kazo du kaset

Ji aliyê Koçer Production du kasetên nû yên stranbêj Kazo hatin belavkirin: "Gola Wanê 1-Bedewê", "Gola Wanê 2-Şêxa Delal"

Di kasetaya yekemîn "Bedewê" de 10 stranên gelêrî, di kasetaya duyemîn "Şêxa Delal" de jî 7 satranên gelêrî cih digirin. Bi giştî stranbêj Kazo stranên gelêrî yên bi şewaza serhewayî (uzun hava) gotine. Li gorî Koçer Production wê hejmaran van kasetan hê jî zêde bibe. Stranbêj Kazo di kasetaya xwe ya yekemîn di ya bi navê 'Bedewê' de ji Hesen Cizrawî, M. Akîf Cizrawî û Kawîs Axa sude wergirtiye. Navê stranên ku di kasetaya yekemîn de cih digirin wiha ne: "Bedewê, Befîr Barî, Ez Nexweş im (Hesen Cizrawî) Çûme Rihayê, Bêrîvanê (M. Arîf Cizrawî) De Xalo (Kawîs Axa) Ez Gula Ber Qufoyê, Zozanê, Melûla Siwara, Şeva Min û Te." Di kasetê de amûrên wekî, tembûr û keman hatine bi kar anîn.


Di kasetaya duyemîn de stranên wekî: Şêxa Delal, Hesen, Xezal, Tahir Xan Bavê, M. Salîh, Were Dotman Xelîlê Xazî, hatine gotin. Di vê kasetaya duyemîn a bi navê Şêxa Delal de amûrên wekî, tembûr û kanûn hatine bikaranîn.

SERWÎSA ÇANDÊ



Hişyarbûn

NEJDET BULDAN



Ez bawer dikim ku rojên pêşiya me, her heyvê du caran em ê bi hev re bin. Bi hev re hindê caran em ê biçin welatê roj û agirî, li deşt û zozanan bigerin. Bi şivanan re em ê nan û şîr bixwin. Di nav şahî û dilxweşiyên gelê xwe de em ê govendê bigerin. Em ê bi beşdarbûna civakan şad bibin. Hindê caran em ê li çiyayan bigerin. Bi şivanan re em ê guhdariya dengê şer û pilingan bikin. Wexta qala welatparêziyê bû jî, ji sedan sed em ê kewên şerxur û xwefiroş bi bîr bin. Û hindê caran jî em ê ji welatê xwe derkevin, bikevine nava rewşa koçberiyê, bikevine gotûbêjên siyasî. Û carina jî em ê raman û dîtînen xwe binivîsin.

Lê belê, di van gotin û nivîsan de tu caran kesên welatparêz nabin hedefa me. Rexne û pêşniyarên me her dem, dê ji bo pêşveçûn û serkeftina gelên Kurdistanê bibin. Wekî tê zanîn mêtîyê me hindê kurdan jî bi tirkî hatiye şuştin û valakirin. Li ber wê çendê, eger kurmançiya me baş û zelal nebit, bila xwendevanên me li me biborin. Armanca me

ew e ku, li gorî dîtîna û ramanên xwe bi kurmançiyê xirab be jî kurdayetiyê bimeşînin û li ser vê pêşgotina kin merhaba! Rojbaş, an jî êvarbaş...

Di van rojan de dewleta tirk benîştêk daye devê xwe, li ser teslîmbûna hindê şervanên kevn ên ARGK'ê. Ev bûyer, ji bo çapemeniya tirk bûye bûyereke gelekî mezin. Serûbinên nûçeyên wan ew bûyer e. Rast e, teslîmbûna şervanekî fermanîdar bûyereke girîng e. Lê belê ne ev qas. Em baş dizanin ku, dewleta tirk vê bûyerê, ji bo xwe dike navgîneke şerê psikolojîk. Ew jî tiştêkî normal e. Şer û dijminahî, li aliyekî bi şerê çekdarî û siyasî tê meşandin, li aliyekî jî bi şerê psikolojîk. Bi taybetî jî tirk di warê meşandina şerê psikolojîk de pispor in. Ev pisporî ji bav û kalên wan tê. Di dema Serhildana Agirî, Şêx Seîd û serhildanên din de jî wan ev progoganda dimeşand. Wê demê teknik û nûçegihanî ewqas pêşketî nebû. Bi balefiran, bombe û belavokên xwe bi hev re barandine ser kurdan. Rast e, tesîra bombe û belavokan li ser gelê kurd çêdibû. Hindê pê hêrs dibûn, welatparêziya wan mezintirîn dibû, hindê jî diketin bin tesîra dijmin.

Bi rastî kurd, ne ew kurdên kevn in. Têkoşîn û şoreşa kurdan jî hatiye guhartin. Pêwîst e dewleta tirk jî wê yekê bizanît. Gelê kurd bi şexsan ve ne girêdayî ye. Azadîxwazî êdî ne siyasî e ji bo kurdan, azadîxwazî jî bo kurdan bûye şewaza jiyane. Gelo dewleta

tirk û hevalbendên wê yên Başûr ve çendê nizanin? Dijminê herî mezin di cîhanê de dewleta tirk e. Lê em ji bo hevalbendên wê yên ku xwe kurd dihesibînin çi bibêjin? Li gorî agahiyên dawî, hevalbendê dijminê Başûrê Kurdistanê, revokê me (kaçaxê me) derxistiye televîzyona xwe û propoganda diket. Ew jî dizanît ku, şoreşa bakurê Kurdistanê bi şexsekî revok ranawestit.

Raya giştî ya kurdan çima li ser revokêkî disekinit? Bi hezaran şervanên kurd li çiyayên Kurdistanê ne. Me bîr û bawerîya xwe bi xayîn û revokan ve girênedaye. Di hemû têkoşîn û şerên azadiyê de qehremanî jî heye, xayîntî jî heye. Heftê hezar çahşên bakur, bi sedan siyasîmedarên li ser navê kurdan siyasîtetê dikin, di nav rewşekî qirêj de ne. Li hemû hêlên Kurdistanê, gelê kurd, di Newrozê de bersiva xiyaretê bi tundî eşkere da. Li koçberiyê, li derveyî welatê xwe, bersiva hevalbendê dijmin da. Li Ewropayê hindê bajar hene ku, nifûsa rayedar û fermanîdarên revok ên hêzeke başûrî, ji hejmara ewrûpayîyan zêdetir e. Tu kes qala wan naket. Ji ber ku qala miriyan ne pêwîst e.

Eger mirov di xizmeta gelê xwe de be, xulamê gelê xwe ye. Ew şerê û rûmeta herî mezin e. Eger mirov di xizmeta dijminê xwe de be an jî mirov di xizmeta hevalbendê dijminê xwe de be, mirov xulamê xulamên e. Ev rûreşiyê gelekî mezin e.

An serfirazî û rûmetiya gelê xwe an jî rûreşiya xwe. Mirov azad e.

Çi ji we re!

Di navbera rêxistinên saloxdayinê (istihbarat örgütleri) ên cihanê de rojekê pêşbaziyek tê lidarxistin. Ji bo pêşbaziye, ji Amerîka CIA, ji Rusya ye KGB, ji Tirkiyeyê MÎT û ji Îsraîlê MOSAD hwd. tèn vexwendin. Wekî ci-hê pêşbaziye jî Afrîqa tê hilbijartin. Li gorî pêşbaziye kî di zûtirîn demê de zûrafeyekî bigire û bîne, dê ew bibe yekemîn û li gorî wê jî xelata xwe werbigire.

Pêşbazî dest pê dike û sixurên rêxistinan li daristanê belav dibin. Piştî nûv seatê sixurên Amerîkî zûrafeyekî digirin û dibin yekemîn. Dû re KGB û pişt-re jî MOSAD zûrafeyekî digire. Yê din jî bi dor zûrafeyekî digirin û şertên pêşbaziye bi cih tînin. Lê sixurên MÎT'ê gelek dereng dimînin. Amadekarên pêşbaziye heta ber êvarkî li benda sixurên MÎT'ê dimînin, lê belê tu pêjn ji wan nayê. Li ser vê, biryar didin ku vejerin hotelên xwe, di vê navberê lê mêze dîkin reşahiyek ji dûr ve xuya dike. Peyre diyar dibe ku ev kes sixurên MÎT'ê ne. Wan bi xwe re filek anîne, le belê ji mezinahiya filê nebe heft şahid lazim e ku mirov bêje ev fil e. Guhê wê jêkirine, zikê wê qelaştine, ser û guhê di nav

xwîne de hiştine. Lê rewşa sixurên MÎT ê jî, ji fil ne kêmtir e.

Sixurên tirk, ji ber ku zûrafeyek nedîtine bi xwe re filek anîne. Piştî demekê amadekarên pêşbaziye heyirîbûna xwe ji ser xwe diavêjin û ji sixurên tirk dipirsin:

- Hevalno me ji we zûrafayek xwestibû, lê ev fil e!" Filê reben xwe davêje pêş û bi amadekarên pêşbaziye re wiha diqîre:

- Çi ji we re! Çi ji we re! Ez zûrafa me! Ez zûrafa me!

Xwarina petêx û hinguv

Derwêşek, di kolakele havînê de, di bin darekê de, ji xwe re sifreyek rast kiriyê, petêx û hinguv daniye ber xwe û ketiye ser. Derwêşê me petêx şêrt (kerî) dike, hinguv jî li ser dike û diavêje elbîka şemo (mîde). Gundiyekî ku zana û têgihîştî ye jî, di ber derwêş re derbas dibe, lê dinihêre ku derwêş li ber tava kelaqî hinguv û petêx dixwe. Gundiyê me dibêje:



- Apê Derwêş di kolakele havînê de hinguv û petêx li hev nakin. Tu yê nexweş bikevî.

Derwêş qet nayne ser eynê xwe, hem dixwe hem jî bersivê dide:

- Tu qet xema nexwî! Zikê me derwêşan, mîna hênbana mirtiban e, tu çi bavêjî qebûl dike.

Gundî di riya xwe de diçe. Piştî demekê vedigere, lê mêze dike ku derwêş

li ser serê xwe, wekî mirîşka serjêkirî diperpîte. Gundî ji derwêş re dibêje:

- Xalê Derwêş! Mîna ji te re negotibû petêx û hinguv li hev nakin.

Derwêş disa jî ji bo ku xwe mafdar derxe, wiha bersivê diçe:

- Birayê delal çi li hev nake! Tu nabîni waye li hev kirine, dilê wan heye min bixine bin axa sar.

RÊNAS LALEŞ

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (114) XAÇEPIRSA

Ş	T	D	J	H	A	D	
Z	E	K	Y	E	A	L	K
M	E	A	R	G	O	S	Î
G	E	L	E	R	I	Z	R
N	Î	Z	R	E	A	R	D
N	Î	M	Î	N	E	N	D
H	N	A	Î	N			
Ç	E	N	G	D	Î		
R	E	T	I	R	Ş		
E	Z	M	Û	N	O	K	

Bersiva Xaçepirsa 112'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 114'an kasetê Kazo 'Gola Wanê' ye.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Mijar	Man	Dengdarê 'ap'	1	Navek mîran(ber epaşkî)	Daçekek Ji bo bûkê birayê zava	5	Heyet
Di xew ve çuyîn	Zîman	Dengdarên 'nig'	Firaqek	Danişanek			
Şehîdek (wêne)			Vegetandek				Dawera 'iyotê'
Poçik							Kortal
			Xeşim		8	Dengdarên 'çej'	
			Ewk, çik			Sewalek	
Tîpa berî 'u'yê	Dawera Nîkelê		Baneşanek				
Nivdengde rek	Çolter		Agir				
3	Tipeke Dengdar Tûmîkê daran	Hetaw (ber epaşkî) Têgîheke diplomasiyê		Navekî mîran(ber epaşkî) Tawan			4
Herêm				Dawera Argonê	2		
Kovan				Roj...			
				Namûs			
				Dawera argonê			
Bi kirdkî 'got'							
Evro				Bi av			
				Tipeke dengdar			
				Parkitek			

Pênc kesên ku xelata hejmarê 112'an Kasetê Şivan (Xewna Min) qezenc kirine: Süleyman Çevik/Stenbol, M.Emin İmret/Yozgat, Fuat Alpergün/Izmîr, Dilan Selçuk/İskenderun, Heci Sertkaya/Semsûr.

PEYVA VEŞARÎ



WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Lî ser navê
Gludem Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibî)
SELAHATTIN DELÎ
Yûnetim Yeri
Çakırağa Mah.
Sorguçcu Sk.
No:116
Tel: (0212) 530 01 40

BÛROYA ÎRTIBATÊ
(IRTIBAT BÛROSU)
Aylan Işık Sk.
No:23/3
Beyoğlu/İSTANBUL
TEL: (0 212)
251 79 37-251 90 13
FAX:251 90 13

Gerimendeyê
Wejane
(Yayın Yûnetmeni)
SAMÎ TAN
Berpirê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Mûdûrî)
M. SALİH TAŞKEŞEN

CAPXANE
Yeni Asya
Matbaacılık A.Ş.
BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım
NÛNERÎYYEN ME
(Temsilcûklerimiz)
Munhen:
(Nûnerê Gijî yê
Ewrûpayê)
Malmut Omergerit
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
Brüksel:
Medeni Ferho
32 532 721 12 03
Swiçre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 17 40
Hollanda:
S. A. Fewz
31 104 85 55 43
Sariye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv

Tîja welatê adirî

Senî ke tîj akewna vewra (vor) koyan vilêşinena û awka ke na vilêşiyayin ra vejyena werte û peynî de pêjewîn ra çiqas dûrî bo jî yena pê hetek. Na tîja ke 30'ê menga 1995 de akewt nay zey awka vewr şarê kurd çosmeyê şewqê xo de arêkerd pêser.

Verê new-des seran, kesî vatayê ziwane kurdiya televîzyon û radyoyê bibê çend kesan bawer kerdê?. Ya vîst hîris kes vejyayê, ya nêvejyayê. Jew ziwane kurdiya televîzyon û radyo jî nê, zew bî çiyane de jî. Nimûne vatayê rojêdo bêro hezaran kurdê Stenbol, Adna, İzmîr, Mersîn, Antalya, yan jî Amed û Wan de bêre pêser û roşanê xo yê Newrozî pîroz kirê. Yan jî, hezaran xortê kurdê vejyê koyanê Kurdistanî ser û qandê welatê xo yê xo-serîn ronayin, vera dewleta tirk û emperyalîstanê bînan lej bikirê. Ezo bawer nêkena vîst kes vejyayê. La belê ek ewro jew vejyoy û vajo badê çend seran şarê kurdo vejyoy azmîn, hezarana mardimî bawer kenê. Çimki ewro şarê kurd zey verî niyê û qandê rindin û weşîna xo, ci dest ra çiyê yenê iyê kenê.

Peyniya nê xebatan de jî şarê kurd, xo da silasnayin. Ewro hema hema ke so ke vengê kurdan nêheşnawo çiniyo. Çimki şarê kurdê kemiyane xo roj ra roj kenê kemî û hetê welatê xo yê xo-serîn ronayin çi lazimo iyê anê ca. Nê kemiyane ra jew jî televîzyon bi. Şarê kurd no kemiyane xo di sera hezar newsey û neway peyra hedreyina televîzyon-akerdin kerd. Çimki ê seran

de dewleta tirk zey dewletanê imperyalîstanê bînan ewna awa nêşena vera şarê kurd bigiro. O çax xortê kurdan qandê reyayina şar û welatê xo qelfe qelfe raya serê koyan tepîştê. Dewlet jî şero psikolojik verî ra kerd vêşî. Her roj jew îtirafkar vetê televîzyonanê xo û îftira çekerde tewgerê azadiyina şarê kurd. Televîzyonana tenya jî nê, o çax rojnameyê ci jî nê kerdenan ra cêr nêmendê.

Dewleta tirk jî kişt ra roşnîkar, rojnameger û kardarê şarê kurd kiştê û nê kerdê propogandaya şerê psikolojikî, kiştê bîna jî bombeyê kimyewî varmayê koyanê Kurdistanî ser û zaf zaf propogandayê nînan kerdê. Wina kerdina wastê hem şarê kurd zûrana bixapeynê, hem bitarsaynê û hem jî xulke şarê kurd taybetî jî xortanê kurdan teng kirê û îradeyê înan bigirê binê bandora xo. La belê dewlet topan, tanqan, televîzyon û zurînananê xo ya senî kerd nêşa şarê kurd bigiro binê bandora xo. Xora nêşayê jî, şarê kurd raya rast û

raya reyayin finê dibî û winî pirêskiyêbî ke raya ne bombanê kimyewiyan û ne mayinan qe tefay nêşa şarê kurd na raya reyayin û azadiyan ra ciya (avirne) kirê. Şarê kurd nê hemû karê lîminê (qilêrinê) dewleta tirk diyê. Xo jî rind zanayê ek televîzyon û rojnameyê ci zey dewleta tirk bibê, raya welatê azadî ronayin bena kilm. Coka hemû hedreyinê xo kerdî û 30'ê menga adara 1995 de dîroka xo de jû riperanewî akerd. Kes şeno wina jî vajo, 30'ê menga adara 1995 de jû tîj akewt û na tîj hemû kayê dewlet xeripnay. Na tîj jû kişt ra vilik, vaş û darê ke bombanê kimyewiyan, topan û tanqan ra pelmiyaybî, ê ardî xo û baxçe, mêşe, bostan û koyê Kurdistanî xemilnay û kiştê bîna ra jî şarê kurd çosmeyê şewqê xo de arêkerd pêser. Senî ke tîj akewna vewra (vor) koyan vilêşinena û awka ke na vilêşiyayin ra vejyena werte û peynî de pêjewîn ra çiqas dûrî bo jî yena pê hetek. Na tîja ke 30'ê menga 1995 de akewt nay zey awka vewr şarê kurd çosmeyê şewqê xo de arêkerd pêser. Na tîj, tîja ma bî.. Na tîj, tîja Kurdîstan û Rohilata Miyane bî.. Na tîj no heftê kewt sera xo ya çeharîn, sera çeharîn pîroz bo. MEMED DREWŞ

Çevre Radyo de hinî her şewa şemî nameyê Zerdûştnamey de jew programo dimilî yo viraziyeno. Viraxtoxê nê programî embaz Zerdûşt Z. Pîranij o. Programo mabenê seat 20.00 û 22.00 banda FM, frêkansa 105.7'î sero desin (canlı) virazyeno. Programanê bînan ra xeylê ferqê ney esto. Goşdarê ke wazenê fikir û vînananê xo biyarê zivan telefona benê tewrê programî. Mi bi xo pêro goşdarin nêkerdî, la belê programê ke me goşdarin kerdî. Pawitinanê mi ra rind viraziyay bî. Çimki hetanî verdê 7-8 seran lehçeya dimilî-

Zerdûştname

ya kes şeno vajo teva nêviraziyayê. Lehçeya kurmacî û soranî goreyê dimilî xeylê şiyê ravey. Kurmancî û soraniya radyoyan da programî viraziyayê. La belê nê çend seranê peynan de hendê lehçanê bînan nêbo jî lehçeya ma da jî xeylê çî viraziyay. Ewro lehçeya dimilî de hinî televîzyon de xebere diyenê, programê bîne viraziyenê kovar, pirtûk û rojnameyê kurdî de niwisê vejyenê. Bêguman nê program û niwisê lehçeya ma asimilebiyayin û vilêşiyayin ra xelisinenê. Ma ke wina bifikiriyimî mihumîna programê Zerdûştnamey rind vînem. Goreyê programanê verinan, peynî diha biyê rindî. Viraxtoxî verî jew xo virastê, la belê di heftêyê oyo meymanan vejeno programê xo. Ancî goreyê verî goşdarên ke raya telefoniya tewrê proramî biyê çisanê înan ra jî keso muhimîna Zerdûştnamey vînenê. Çimki verî wexto ke goşdarî geyrayê her jewerî tevayê vatê. Yanê nîme tirkî nîme kurdî. La belê nê proxramanê peynan de ezo vînanê êkê verî qesey kerdê vêşiyê ci tirkî bî ewro ê kerdê kemî û ek programê Zerdûştnamey bigoşdarne iyê roj ra roj kemî kirê.

ÛLKEDE

Ji Gündemê

Manshetên qedexekirî

28 adar 1998 şanî:

'ÖCALAN DİYALOGÊ DIXWAZE'

Profesorê amerîkî Michael Gunter, ku bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevdişînek pêk anîbû, got ku Milliyetê gotinên wî berevajî kirine. Profesor Gunter diyar kir ku, Öcalan ji wî re gotiye, eger ku Tirkiye demokrasiyeye rastîn bi cih bike, kurd dikarin di nav sînorên Tirkiyeyê de bijîn. Gunter got, li Tirkiyeyê pêkhatina demokrasiyeye rastîn tê maneya xwefadikirina azad a kurdan. Her wiha Gunter qala danûstandina Îsraîl-Filistinê kir û da zanîn ku divê Tirkiye ji bi nûnerên kurdan re hevdişînek pêk bîne. Gunter wiha berdewam kir: "Ku Tirkiye di çareserîya leşkerî de îsrar bike, wê kurd tundra (radikal) bibin." Gunter diyar kir ku DYA dixwaze pirsîgîrê kurdan wekî 'ihlalên mafên mirovan' bîne rojevê û wiha got: "Pêwîst e DYA ji vê yekê bêhtir tiştan bike." Gunter, daxuyand ku Öcalan mesaja qedandina daye û xwest ku ev mesaj hem bigihêje dewleta tirk û hem jî bigihêje DYA'yê.

29 adar 1998, yekşan:

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan:

GEL NAYÊ XAPANDIN

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, diyar kir ku wan Şemdin Sakik qewi-

randiye û got li hemberî gelê kurd bêhurmî û dirûfî naye pejirandin. Öcalan wiha berdewam kir: "Li aliyekî kesên ku ji bo gel canê xwe dişewitînin û xwe diyarî dikin, li aliyekî jî kesên ku dixwazin li ser navê wî politikayên erzan bimeşînin, hene." Öcalan got, di nav PKK'ê de cihê politikaya erzan tune ye. Öcalan diyar kir ku ew li dijî Sakik in, lê dewleta tirk wekî 'diktatoriya Apo' nîşan dide. "Ez ji dewleta tirk dipirsim; gelo kuştina 33 leşkerên bêçek baş e? Ew bûbûn cinawir. Tu tîkiliya PKK'ê bi van kirinên qirêjî re tune ye. PKK li rastê ye. Lê rewşa kesên ku reviyane û teslîm bûne ji li rastê ye." Öcalan bal kişand ser helwesta dewleta tirk û da zanîn ku, dewleta tirk fermana kuştinê dide îtiraftaran, zagonên şer bînpê dike, lê PKK li dijî kesên mîna Sakik, helwestê digire. Öcalan wiha berdewam kir:

"PKK di vê mijarê de rewşa xwe ya hundirîn li ber çavên raya giştî radixe. Dibejin: 'PKK ji hev veqetiya, Apo tenê ma.' Ez alîgirê xebata bi kesên rûmetdar re me. Bi kesên ku li dijî gelê gelê xwe û ne durist in re tîkiliyên min çênabin."

"Diya min, welatê min e"

Girtiyê PKK'yî Fikri Baygeldi, ku di Newrozê de li Girtîgeha Çanakaleyê, ji bo protestokirina zilm û zordariya dewletê ya li ser gelê kurd, kolonya bi ser xwe de dakiribû û xwe şewitandibû, li Adapazariyê hate veşartin. Di merasîma ku malbata wî û kurdên

li heman taxê beşdar bûn de, dirûşmeyên wekî "Şehîd namirin", Agirê Newrozê venamir" hatin avêtin.

Bavê Fikri Baygeldi, Ramazan Baygeldi piştî ku termê lawê wî hate veşartin, bihîst ku lawê wî heta berî ku rihê ji biçê jî wesiyeta "Diya min gelê min e ku serî hildide, gelê min e ku azad dibe ye" kiriye. Li ser vê yekê Ramazan Baygeldi wiha got: "Eger ku haya min jê hebûya, minê lihêfa li ser wî bifirota û minê ew bibira welatê wî", diya wî Mesude Baygeldi jî wiha axivî: "Kurê min bi zanayî ev çalakî ji bo dayikên kurd pêk anî."

30 adar 1998, duşan:

EGÎD PIR DIBIN

Ji bo salvegera şehîdîna Fermanîyê Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) Mahsum Korkmaz (Egîd) û bi boneya Hefteyê Lehengiya Neteweyî çalakîyên bîranîne dom dikin. Li Amedê çalakîya ku li HADEP'ê hate çêkirin, bi deqîyeyek rawestîna bo rêzgirtinê dest pê kir. Di bîranîne de şexsiyeta Mazlum Doğan û Mahsum Korkmaz bi awayekî berfireh hate vegotin. Xwişkên Mahsum Korkmaz, Maşalah Korkmaz Dağ û Aynur Korkmaz jî beşdarî vê çalakîyê bûn. Wan diyar kir ku Egîd ji biçûkiya xwe de li dijî neheqiyê derdiket. Xwişkên Egîd wiha gotin: "Di nav malbatê de jî li dijî mêtîngeriya li ser jinan helwesteke wî hebû. Kurdbûna xwe bêtirs û biserbilindî eşkere dikir." Korkmaz Dağ, xiyaret nirxand û wiha got: "Di van rojên dawî de ligel hin kesên ku xiyaretê dikin, hin kesan jî bedena dan ber êgir û xiyaret lanet kir. Ev rastî jî dide xuya kirin ku kesên wekî Egîd hene û pir dibin."

31 adar 1998, sêşan:

LI ERZÎNÊ WEHŞETA LEŞKERAN

Roja 19'ê adarê hatibû ragihandin ku li Sofulara Erzînê û Olukbaşîya Osmaniye di nav leşker û gerilayan de pevçûn derketiye û 8 gerilayan jiyana xwe ji dest daye. Lê diyar bû ku ji wan yek jin du kes bi saxî hatîne girtin û leşkeran ew li gundê Kuyuk infaz kirine. Piştî bûyerê gundiyê ku me pê re hevdişînek pêk anî diyar kir ku, leşkerên ku hatîne gund, ew li meydanê civandine û du gerila li ber çavê wan kuştine.

Gundiyekî jî da zanîn ku, ew gelekî tirsîyane, ji ber vê yekê dengê xwe demexistine û bûyer wiha vegot: "Hin ji leşkerên ku gerila kuştibûn dû re êrişî cesedên gerilayan kirin. Bi sungu (nize) û hesinan cesed perçe kirin. Peyre uzman çawîşekî parçeyên serê gerilayan ku avêtin ber kûçikan." Her wiha got ku leşker her tim wan tehdît dikin.

Termên gerilayan roja 20'ê adarê bi erebeyeke servekirî ya Belediyeya Erzînê ji herêmê anîn, demekê li navenda navçeyê gerandin. Dûv re cesedên gerilayan birin li hewşa pişt Qomutaniya Tofa Cedermeyan teşhîr kirin. Nîştêcihên navçeyê gotin ku, ew li dijî vê wehşetê şaş û metel mane û diyar kirin serên hinan jê parçe parçe bûbû. Her wiha gelê navçeyê da xuyakirin ku Doxtor Ha-



kan Alpar û Dozgerê Cumhuriyetê Necat Çakar jî piştî ku ev dîmen dîtine li dijî leşkeran reaksiyon nîşan dane. Doxtor Hakan Alpar û Dozger (sewci) Necat Çakar jî gotin ku gava ew çûnê cihê bûyerê, serên gerilayan hatibûne parçekirin. Wan got ku encama otopsî û fotografên bûyerê bo DGM'ê şandine.

1 avrêl 1998 çarşan:

LAŞÊ WÎ DAN MALBATA WÎ

Li nêzikî gundê Tûtê bi ser Licê, wasiteyeke leşkerî li mayinekê tenqşkên qelibû, di encama teqînê de 3 leşker hatibûn kuştin. Piştî vê yekê leşkeran girtibû ser gund û ji 50 gundiyên ku girtibûn ji bilî Ali Üçgül, Sefer Okçu û Salih Başak ên din serbest berdand. Gundiyên ku serbest hatin berdan diyar kirin ku, leşkeran îşkenceyên xedar li wan kirine û M. Eminê ku 70 salî bû di encama van îşkenceyan de ketibû erdê.

Her wiha gundiyan gotin, 3 girtiyên di bin çavê de, ji ber îşkenceyan ji halê ketine û xwestin ku Komeleya Mafên Mirovan û rêxistinên girseyî yên demokratîk ên din serlêdanan pêk bînin. Laşê, Öner, ku di bin çavê de, ji ber îşkenceyên xedar jiyana xwe ji dest dabû, teslîmî malbata wî hate kirin û li gundê Tûtê hate hilanîn. Malbata wî ku koçî Amedê cem nasên xwe kirine jî diyar kirin ku, ji ber wahşeta ku jiyane di metirsîyê de ne.

2 avrêl 1998 pêncşan:

Seroka Komîsyona Mafên Mirovan a TBMM'ê Sema Pişkinsüt:

ÎŞKENCE BI SÎSTEMÎ TÊ MEŞANDIN

Di zîrveya mafên mirovan a dewletê de ku bi walî û midûrên emniyetê yê 80 bajarî re hate çêkirin, ligel beşdarbûna Serokomar, Serokwezîr û rayedarên dewletê hate îdiakirin ku îşkence munferit e. Lê Seroka Komîsyona Mafên Mirovan Sema Pişkinsüt di daxuyaniya xwe ya li Amedê de diyar kir ku îşkence bi sîstemî tê kirin û wiha berdewam kir: "Gava ku fikra wekî îşkence heq kiriye derkeve holê, dawî li hiqûq hatiye." Her wiha Pişkinsüt got ku ji ber rewşa li herêmê îşkence bêhtir tê kirin.

Pişkinsüt bal kişand ser vê yekê ku îşkence bi cezakirina 3 an 5 karmendan nayê asteng kirin û got şexsiyeta û tevgerên midûrên girtîgehan li ser hemû mehkûman bandor dike. Pişkinsüt wiha axivî: "Hin midûr mekî-nîzmeyên îşkenceyên xedar çêdikin û li gori wan ew baş dikin. Pêwîst e ev kadro bi programên li derveyî pişeyê bîn perwerdekirin."

